

# POPKURD

09/2020 • Jimar 8

e-Kovara Kultura Populerê


## HINÊR SALEEM

“EZ DI NAVBERA EDEBIYAT  
Û SÎNEMAYÊ DE MAME”

POPPIRS: HÊVÎDAR ZANA



TENBÛRA YARSAN - SHAHAB VALÎ



DILKETIN - MINEWER ASLAN



Silav li we bin bengî û bendewarên popkurd'ê! Heta ji me bê,  
me ji bo we dîsa ji gelek waran naverokeke dewlemend ava kir.  
Bi hêviya ku kêfa we jê re were; kerem bikin hejmara 8an li ber  
'tiliyên' we ye.

POPKURD  
e-Kovara Kultura Populerê  
09/2020 • Jimar 8

**Edîtor**








Mistefa DOGAN  
Ömer SÖNMEZ

**Alîkarê Edîtoran**

Ridwan XELÎL

**Rûpelsazî**

GrafîKURD

	+90534 325 3629		popkurdkovar		
	PopKurdKovar		PopKurdKovar		popkurdkovar@gmail.com
	popkurdkovar.wordpress.com		channel/UC7OVendzXoCAzJC2wf_KVYw		

# NAVEROK



**Rockbêjên Kurd  
Dipeyivin**  
|04



**Wergera Ji Wergere**  
Mutercimên Kurd Çi Difikirin?  
|12



**PopPirs: Hêvîdar Zana**  
|17



**Midbexa Kurdî**  
Keledoş: Bahar Çe  
Girar an jî Mehîr: Mamoste  
Bêrîvan |19



**Kurtepişt**  
Popkurd |23




**Tenbûra Yarsan**  
Shahab Valî |24



**Roportaj:  
Hinêr Saleem**  
Omer Bextîyar | 27



**Dilketin**  
Minewer Aslan |36



**Kurmancên Zazakîzan  
û Zazayên Kurmancîzan**  
|37



**Fûtbolîstên Kurd**  
Harûn Eren |41



**Me Ji 10 Kesan Pirsî**  
Popkurd |45



**Dawiya Dawî Derewên  
Serdestan (Spiyan)  
Derdikevin**  
Berrî Shemdîn |48



**Derengxistina  
Extiyariya Çerm**  
Dr. Rodî Zanyar |50

# ROCKBÊJÊN KURD DIPEYIVIN

POPKURD'ê di vê hejmarê de ji bo we, guhê xwe da Rokcbêjên Kurd. Ka em binêrin bê ka wan çi cewabî dane pirsên me.

-1-

Tu di çanda xwe de newayên muzîka Rockê dibînî an li ser bingeha Ewropî-Emerîkî muzîka xwe ava dikî?

-2-

Di mûzîka cîhanê de kesek heye ku tu bêjî wî/wê gelek tesîr li min kiriye?

-3-

Ji hêla organîzasyonan ve rewşa muzîka Rockê çawa ye di nav Kurdistan de? Mekan hene ku tu li gorî dilê xwe muzîka xwe peşkeş bikî?

-4-

Dema tu kare xwe dikî, (di hemû merheleyan de), herî zêde çi te aciz dike, diwestîne?

-5-

Kurd ji Rockê hez dikin gelo? Heke "na" be, bi ya te sedem çi ye? An jî tu ji hejmara guhdarên Rocka Kurdî razî yî?



-1-

Ne tenê ez(em), li ser dinyayê tu humermend nîn e ku koka wî/ê ya çanda gelêrî, netewî nebe. Çend formên hunerê yên navneteweyî hebin jî, ev form ne bi serê xwe; bê dîrok, bê kok in. Formên ku jê re “navneteweyî” yan jî “Emerîkî”, “Ewropî” tên gotin jî, bi eslê xwe ew nirx in ku di nav hemû çandan de hene. Mînak; muzîka rock li ser rîtma “2 kurt 1 dirêj” e. Di wêjeya diwanî de ev rastî “failûn failûn failatûn”ê tê. Di nav jiyane bi xwe de, ev form hene. Mînakeke din, li evraz (rojawa) forma ku jê re dibên Jazz, li şerqê (rojhatê) meqamê Hîcazê ye.

Her çi qas enstrûmanên me, enstrûmanên Ewropî, Emerîkî bin jî, ew tenê enstrûman in. Gotinên me pêşî netewî, paşê gerdûnî ne. Her wekî din; em endamên civakeke şerqî ne. Em Kurd in, ne Ewropî ne jî Emerîkî ne.

-2-

Di muzîka cîhanê de her kes tesîrê li ser her kesî dike. Yê ku li ser me tesîr kirine jî gelek in. Lê tesîra herî mezin, tesîra çanda gelê me, ya dengbêjên me ye. Guhdarên mûzîka metalî dizanin ku kî li ser vê formê tesîra mezin dike. Li ser me Fadilê Cizîrî jî tesîr kiriye, Metallicayê jî.

## FEREC

Ji Colemêrgê ye û niha li Wanê dimîne. Nêzîkî 25 sal in karê muzîkê dike.

-3-

Gelek mekan nîn in ku li gor keyfa xwe em muzîka xwe îcra bikin. Ev ne tenê kêmasîya me ye; li nav hemû civakên şerqî, yê ku muzîka wekî me dikin pêrgî heman pirsgerêkan tên.

-4-

Tiştê ez aciz kirî nayê bîra min. Gelek asteng derdikevin ber min jî (wekî her kesê) lê ya girîng, mirov neweste û gava xwe paş ve neavêje. Zor û zehmetî pir in lê inada min jî pir e.

-5-

Ez bawer im ku Kurd ji gelek civakan bêhtir jî rockê hez dikin. Jiyanêke wekî ya Kurdan, ji xwe kanî ye ji bo humermendên serhilder. Civakeke wekî Kurdan xwedî qêrîn û gazind û serhilder nîn e. Rock û formên wê jî ji Kurdan re bîyanî nîn in.





## HARÛN ELKÎ

Di sala 1975an de li Bêşebabê hatiye dinê. Ji ser sedemên aboriyê malbata wî di sala 1997an de koçî Edenê kiriye. Elkî, li Edeneyê li Navenda Çanda Mezopotamya dest bi xebatên xwe yê muzîkal kir. Piştî demeke kin tevî Koma Rewşenê bû. Piştî belavbûna komê Harûn Elkî li Stenbolê dest bi pêvajoya xwe ya solo kir. Sînglên wî yê bi navê “Tutunma”, “sus” û “seyrana gulan” hatin weşandin. Niha li ser albûma xwe ya nû dixebite.

-1-

Ew ruhiyeta ku Rock xwe jê peyda dike, di her civakê de heye. Li Ewropayê an jî li Emerîkayê gihîştîye asteke ku navek lê hatiye kirin. Lê nayê wê meneyê ku aydê wan e. Rock, sermiyana hemû mirovahiyê ye. Bêguman di çanda Kurdî de jî ev rûhiyet heye. Rock, tiştekî sistematîk e, heta niha gelek ceribandînin hatine kirin û gihîştîye qonaxekê. Ji Koma Wetan vir ve Kurd jî diceribînin. Nifşê me derket û niha gelek hevalên din jî hene ku dixwazin di vî warî de ceribandînan bikin. Helbet gelek tesîra muzîka Emerîkî û Ewropî li ser min çêbûye. Lê ez bawer im ku min tama xwe ava kiriye. Min dixwest vê muzîka ku li min tesîr kiriye, li ser zimanê xwe ava bikim. Herçiqas bingeha xwe ji wir girtibe jî, muzîka ku ez çêdikim ne ya Ewropî û Emerîkî ye.

-2-

Di destpêkê de muzîkên hişk li min tesîr dikirin, yê wekî “heavy metal.” Bo nimûne Metallica û Iron Maiden...

Piştî demekê ew muzîkê li mirov tesîr dikan jî diguherin. Bi pêvajoya Koma Rewşenê pê ve jî min herî zêde Jon Bon Jovî, Ganzen Rossed, Eric Clapton guhdarî dikir.

-3-

Ji bo muzîka Kurdî bi giştî di warê konser û organîzasyonan de ew geşbûna berê, ev demek e tune ye. Îcar di warê muzîka Rock û ya alternatîf de organîzasyonêke wilo qet tune ye. Kî çi bike, ev berxwedanek e. Niha em hewl didin di vê meselê de bergehên nûtir ji xwe re bibînin.

-4-

Ez wekî kar, aranjor im. Di vî karî de tiştê ku herî min aciz dike bêperwerdehî ye. Mixabin ev di hemû civakê de wisa ye. Ew eniyên ku em muxatabî wan dibin ji perwerdehiyêke cidî bêpar in.

Li aliye din jî zextên li ser çand û zimanê Kurdî nahêle ku em xwe bi hêsanî ava bikin.

Tevî van zor û zehmetiyan jî, di nav Kurdan de eniyêke xurt heye ku dixwaze tiştekî çêbike an jî biafirîne.


-5-

Kurd ji gelek tiştan hez nakin, ji ber ku nas nakin. Ji bo meriv ji tiştekî hez bike, divê meriv wê bizane. Kurd gelo ji Jazzê hez dikan mesela? An jî ji muzîka Fujî? Esasen li gorî gelek miletan, mêjiyê Kurdan gelek vekirî ye. Lê mixabin miletê me, exlebê di nav şerekî jiyane de ye. Di warê

aborî û siyasî de, di her qadî de. Ew derfeta wan nabe ku ji hêla kulturî ve xwe bi pêş ve bibin. Ji bo meriv tiştekî nas bike, hez bike hestek lazim e. Ew hest, te ber bi wî tiştî ve dibe, meseleya Kurdan û Rockê jî ji hêlekê ve werê ye.

Me tovek çandiyê. Roj bi roj ciwanên me yên xwende û zana, didin pey hestan û li riyên nû digerin. Ez bawer im wê hîn baştir bibe her tişt.





## WEDAT TANIŞ

Ji Wêranşara Rihayê ye û niha jî li wir dijî. Li Îzmîrê, li Zanîngeha 9 Eylûlê beşa mamostetiyê qedandiye. Ji zanîngehê pê ve bi muzîka rock re mijûl e. Ev 5 sal in stranan derdixe. Çend sînglên wî yên wekî “Hespên Bajêr”, “Ballada Şivanekî” û albûmeke wî ya bi navê “Mayîndeyên Sînoran” hene.

1-

Muzîka em ava dikin muzîkeke biyanî ye. Bi hestan ve belkî min nêzîkî çanda xwe dîtibe lê ji aliyên newayan, cûda ye.

2-

Çar kes hene, bi navê Pink Floyd. Komeke ji Îngilistanê ye û bandora wan li ser min gelek e.

3-


Mixabin platformên îcrakirina muzîka Kurdî her ku diçe bêhtir asê dibin. Ne tenê ez, tu kes bi dilê xwe muzîka xwe pêşkeş nake. Ji ber ku tehdeyeke gelek mezin li ser Kurdan heye û ne tenê bi muzîkê, bi her awayî xweîfadekirina Kurdan hatiye astengkirin. Jixwe muzîka Rock jî ne tarzeke populer e di nav Kurdan de. Lewma ji aliyê organizasyonan ve ez dikarim bêjim rewş ne baş e.

4-

Herî zêde di pêvajoya qeydan de diwestim. Qeyda stranan gelek dem dixwaze û ji bo qeydeke baş gelek tişt divên. Ez bi hemû beşên qeydan re tenê mijûl dibim, ji ber wê carinan diwestim ya rast.

5-

Wekî min di pirsra yekem de jî got, em muzîkeke biyanî ava dikin, herçiqas zimanê wê bi Kurdî be jî, hemû formên wê biyanî ne. Ji ber wê, di nav Kurdan de pir cih negirtiye ev muzîk. Guhê Kurdan hêj hînî rock muzîkê nebûye. Li aliyekî din, rock êdî li tu derê wekî demên berê nayê guhdarîkirin, sedema wê dirêj e lê ez bi kurtasî bêjim; roja jiyana me ket telefonan, em hemû teral bûn û em naxwazin xwe zêde biêşînin. Ev di muzîkê de jî wisa ye. Mirov dixwazin muzîkên ku zû tèn daqurtandin, yên li ser fikirîn hewce nake, guhdar bikin. Ji ber wê, muzîka rock zêde nayê hezkirin.







## OZAN IRMAK

Di sala 1987an de li Qoserê ji dayîk bûye. Heta lîseyê li bajarê Konyayê maye, çîroka wî ya muzîkê ji lîseyê dest pê dike. Li zanîngeha Çukurovayê ya li Edenê, beşa Endezyariya Tekstîlê qedandiye. Di sala 2013an de dest bi xebata xwe ya besteyan kir û salek pişt re albuma wî ya bi navê 'Ji Sorî' derket. Niha di lijneya kovara Ziryabê de ye. Li ser nivîsandina pirtûkeke muzîkê ya teknîkî dixebite.

1-

Rock, muzîkeke bajarî ye, dîroka wê li bajaran dest pê dike û helbet çanda wê jî bi çanda bajarvaniyê tevgeriyaye. Lêbelê dema rockê ji xwe re helwesteke gerdûnî afirand, gihaşt hemû dinyayê û navê xwe li dîroka civakan nivîsand. Dema John Lennon digot 'Imagine', behsa hemû netewan û însanan dikir. Ew sewt, di salên 70î de gihaşt Kurdan jî û bi navê Koma Wetan, dîroka Rocka Kurdî dest pê kir. Rock, ji aliyê teknîk û wateyê ve, helwestek e. Rockbêjekî/e Emerîkî yan Kurd, ji aliyê çand û jiyanê ve ne mîna hev bin jî, ji hêla perspektîf û hestebariyê ve, wekî hev in.

2-

Bi rastî ez heyranekî System Of A Down im û gelek tesîr li min û muzîka min jî kiriye. Serj Tankian(solîstê SOAD) û Tom Morello (gîtarîstê Chris Cornell) cara ewil sazîyeke gerdûnî ya polîtîk damezrandine û li hemû dinyayê (lê piranî li Afrîkayê) berê xwe dane pirsgerêkên gerdûnî. Rockbêjên ku him bi muzîka xwe him jî bi şewaza xwe li dijî desthilatdariyê bin, bala min dikşînin.

3-

Ev pirsgerêkeke mezin e. Ji bo rockbêj performans û konseran bidin lazim e sehne û mekanên li gorî rockê hebin. Heger derfet tune bin, em jî muzîka xwe kêr dikin, enstrumanan kêr dikin, repertuaran kêr dikin, carinan jî muzîkjenan kêr dikin. Ango tim kêr dimîne. Rock, muzîkeke dîtînî ye, di albumê de te çî lêxistibe, divê tu wê li ser sehnê jî lêxî; heger derfet tune be, muzîk jî performans jî kêr dimînin. Gelek hevalên ku ez wan nas dikim derbasî performansên akûstîk dibin, ez jî.

4-

Ji studyoyê heta sehnê, ji însanan agresîf, pozbilind û bigazind hez nakim. Organizator be, muzîkjen be, tonmaister be... Di hemû merheleyan de ez dixwazim karê xwe bikêf bikim. Heke tiştêkî wisa bibînim ez gelek aciz dibim. Wekî din jî li provayan, muzîkjen û tonmaisterên ku neyên an jî dereng bimînin, hinekî canê min aciz dikin.


5-

Kurd ji sedî sed ji rockê hez dikin lê pir nedîtine. Bi taybetî ciwan dixwazin me li ser dikan bibînin, serê xwe bihejînin, dansê bikin, bang bikin, dengê xwe bilind bikin.

Çimkî dixwazin dil û ruhê xwe, bi dengê gîtarê û bi vokalên ji qirikê tije bikin. Ez rind dizanim ku hin kes hene, carinan wekî min performansên Ciwan Haco yên Med TV'yê temaşê dikin, çimkî tenê ew performans dil û ruhê min tije dike. Dema dibê 'bi sond û bi peyman ez kûç nahêlim li ser kûçan...ez li vir im û bar nakim, ez li vir

im...' Ha ev dilê min tije dike. Ji ber ku rock tiştêkî wisa ye, gerek e dil û ruhê însanan jî bikelîne.

Bi rastî ez guhdarên xwe najmêrim û dilê xwe jî nahêlim, kêmbin zêdebin...Yên ku biyecibînin an neecibînin ser seran, ez pir li dû van tiştan nakevim.





## MIROV

Di sala 1993an de, li Bismila Amedê hatîye dinê. Li Stenbolê dijî. Li İzmir û Çanakkaleyê xwendiyê û di demên zanîngehê de li kolanan stranbêjî kiriye. Albuma wî ya yekemîn, “Kêzikê Sergêj” di sala 2018an de derket. Aniha bi Jehat Hekimoğlu re li ser albumeke nû dixebite. Ev album, dê ji helbestên Roşeng Rojbîr pêk bîn.

1-

Bi ya min , mirov nikare li ser vê pirsê bersivekî ji sedî sed rast bide. Lê pêşî ez çanda xwe dimijim û xwe pê têr dikim. Wekî din, tesîra çanda Ewropayê jî, Emerîkayê jî, Îngilîzan jî, Faris û Tirkan jî li ser hunera min heye.

-2-

- Bob Dylan û Ciwan Haco.

-3-

Na, tune ne. Ne organîzasyon ne jî mekan. Belkî hene, lê ne ji bo hunera min û rockê ne. Çend caran min xwest ez ligel hevalên ku yên wekî min dixebitin û muzîka xwe ava dikin, organîzasyonan çêbikim lê nebû, nabe. Bi tena serê xwe naçe serî. Kesên ku karê organîzasyon û menajeriyê dikin tune ne. Ya rast ne ku tune ne, hene; lê tune ne, pirsgirêkeke din jî ev e.

-4-

Mirov.

-5-

Bi rastî ez ji xwe re nikarim bibêjim rockvan an jî rockbêj. Bila ev gotin li vir be. Tenê ez dixwazim muzîk û hunera xwe bidim nîşan. Dixwazî rock, dixwazî blues, dixwazî jî pop. Sînor ji her aliyê ve ne baş in.

Yên ku ji vê hunerê hez dikin hene, lê pir hindik in û ez ne bawer im jî pir bibin. Sedemên vê jî dikarim heta serê sibê qal bikim.

Lê ev jî ne karê min e. Ez qal bikim jî nakeve serê min ku kesek guh bide min. Ez bim, rexnegir lazim in ji bo vê pirsê, an jî ji bo van pirsgirêkan. Kes qala “rock”ê nake. Yên ku qal dikin jî nezan û êrîşkar in. Ji xwe rock û blues, li hemû cîhanê wekî berê nayên guhdarîkirin. Rock, blues, funk... Wextên xwe yên xweş û baş birin serî, qedandin. Lê rock bi xwe naqede.

Hêjmar gerek ne ewqas girîng be ji bo hunerê. Lê erê, pir bibe baştir e.




# WERGERA JI WERGERÊ

## GELO MUTERCIMÊN KURD ÇI DIFIKIRIN?

Meseleya wergera ji wergerê yanî wergera ne ji zimanê orijînal lê ji zimanê duyem an sêyem, gelek caran di nav Kurdan de dibe sedema nîqaşê. Piştî wergera “Sûc û Ceza” ya romana Dostoyevskî ku ji Weşanxaneya Nûbiharê derket, ev mesele dîsa hat ber me.

Me ev mesele ji wergêrên Kurd sewal kir. Bê ka gelo ew li ser wergera ji wergerê çî difikirin?



**Kawa Nemir**

Hê teze ez bi wergera Sûc û Cezaya berhema klasîk a Dostoyevski bo Kurdîya Kurmancî hesîyam ku Medeni Öğüt ew wergerandiye û Nûbiharê çap û belav kiriye. Ji şikberîyê der e, dema ku berhemî ji zimanên bîyanî bo Kurdî tîn wergerandin, belkî bêtirî her kesî ez şa dibim, lêbelê, wekî hûn ê jî rind tê derxin, pîrsa min a pêşîn ev e di vî barî de û devîdevî sî salan e ez her dipirsim û dibêjim: Gelo ev berhemî ji zimanê resen hatiye wergerandin yan pê paçik û laçikên zimanê duyem û sêyem hatiye parzûnandin û hatiye ber me? Bê guman, ya pêşîn, ez hê çav bi wergera Sûc û Cezayê neketime, lê, ya duduyan, ji vir de jî û ji niha ve jî ez dikarim bibînim û bibêjim, kar û xebatên wergerandinê yên bi vî rengî, mixabin, dê sûd û mifayeke wisa zêde negihinîne Kurmancîya me ya ku bere bere, nemaze li Bakurê Kurdistanê, dibe mêvana nalîk û balîfkê. Du hoy û egerên pîrr giring (crucial and vital) hene ku ez vê dibêjim. Heke

wergêrên me (hindek rewş û bar û doxên taybet ne tê de, ku ev meseleyeke dût û dirêj e bo niha) dê wergerandina ji zimanê duyem û sêyem (ne ku ez li ber ked û kêferata wan nakevim) li ser warê wergera Kurdî ferz bikin yan jî rewşa bikin, bi raya min, di vê pêgehê de yekser ev du binema dikevîne ber kar:

1- Meydana veguhestin, raguhestin û mexandinê ya di navbera zimanê jêderk û ferhenga (keltora) jêderk û zimanê me û ferhenga me de hê di serê sêrî de tê rûxandin û jinavbirin, bi destê me.

2- (Dîsa hindek rewşên taybet û -qenebergerandina berawirdkî ya firehzimanî ne tê de, her wekî wergerandina di warê tibê, teorîk û hwd. de) ev wergerên bi vî rengî dibine bayîs ku, bivê nevê, vesazbûna tevayîya zimanê me bikeve telle û tepikên zimanê Tirkî, 'Erebî û Farisî ku ji vî layî ve ziman û ferhengên kolonyalist in bo me Kurdan.

Min tewqe û tika ye ji heval û hogirên wergêr -jixwe em ne bi hezaran in- û ji weşanxaneyên me ye ku em fêrî zimanên cîhanê bibin û rê nedinê wekî meyleke wisakarî li ser me ferz bibe da ku keda ti kesî/ê dêris nebe.

**Osman Mehmed**

Hin kodên kulturî, civakî û siyasî yên miletan hene. Dema berhemek ji zimanekî din tê wergerandin, li gorî van kodan çarçoveya tercumeyê diyar dibe. Îcar dema em ne ji zimanê eslî, ji zimanê duyem tercumeyê bikin, ev werger wê ne li gorî eslê berhemê li gorî zimanê ku te jê girtiye (zimanê duyem) li ser zimanê bê veguhestin. Bo nimûne dema te ji berhemê Almanî di ser Tirkî re wergerand,

esasen tu berhemêke Tirkî werdigerînî û ev zirarê dide zimên jî û berhemê bi xwe jî texrîb dike.

Di salên 2004-2005an de ez li Başûr bûm, wê demê li wir jî pêlek dest pê kiribû. Nexasim li hêla Silêmaniyê, gelek berhemên dinyayê bi ser Farisî re dihatin wergerandin. Îcar bifikirin; ew berhema ku bi Farisî re diqelibe ser Kurdî, him berhemêke sansurkirî ye (ji ber rewşa siyasî ya Îranê) him jî ji ser kodên kulturî, çandî û siyasî yên Farisî re bûye Kurdî û ev zîrareke mezin dide zimanê me.

Ji loma jî heta ne pir elzem be, miroz ji zimanê duyem wergerê neke, baştir e.

**Fexriye Adsay**

Belkî mirov nikaribe bi awayekî hişk bibêje 'erê' an 'na'. Ger wekî din alternatîf tune be, dibe ku ji zimanê duyem bê wergerandin. Carnan, lê ne her tim, ev dibe ku ji tunebûnê çêtir be. Her werger bi xwe bi qisûr e û di wergera ji wergerê de ev qisûr zêdetir dibin. Dema wergera ji wergerê tê xwendin divê mirov qebûl bike ku berhema ew dixwîne qisûrên wê zêdetir in. Bawer dikim qisûrên di berhemên wêjeyî de jî wê gelekî zêdetir bin ji yên akademîk. Îjar ev zimanê duyem Tirkî be, mesele aloztir dibe. Ji ber ku Tirkî ji bo me ne zimanekî notr e. Zimanê serdestên me ne û mixabin em dizanin Tirkiya me ji Kurdîya me xurttir e, ya wergêran jî. Her çiqas min wergerê ji Tirkî nexwendibe jî, texmîn dikim wergera ji Tirkî, bandora Tirkî ya li ser zimanê me xurttir dike û loma qisûrên wergerê jî wê zêdetir bin. Bi dîtina min, em di her qadê de bikaribin xwe çiqasî ji Tirkî dûr bixin ewqasî baş e, ev dê ji bo kesayetiya me jî baştir be.

Ya din, ji dêvla ku em tenê li dor 'erê' an 'na'yê nîqaş bikin, ka em li ser vê bisekinin ku çima em mecbûr dimînin ji Tirkî (wekî zimanê duyemîn) wergerê bikin? Çima piyaseyeke me weşangeriyê ku bikaribe wergêrên zimanên sereke yên dinyayê derxîne, tune ye? Werger bi giştî çiqas tîn xwendin û nirxandin? Keda wergêr û weşangêr bi ku ve diçe?

**Abdullah İncekan**

Meseleya wergerê bi serê xwe meseleyeke tevlihev û felsefîk e û em ji ber sebebên ku tîn zanîn, teze-teze dest bi nîqaşên li ser mijara wergerê yan jî wergera ji wergerê dikin. Ev destpêkeke bi xêr e. Her werger di eslê xwe de şîroveyek e; yanî wergêr li gorî zanîn û tecrûbeyê xwe (ya jî hêlên cihê-cihê) metna ku dixwîne, fehm dike û wê di zimanê din da dîsa ava dike. Hem fehm, hem jî avakirin hetanî noqteyekê şîrove û hostatî ye. Loma jî di herdu hêlan da gelek çarçûn di navbera metnên hatine wergerandinê de ferq hene û ji ber vê jî gelek metin (wek metnên dînî û klasîkên cihanê) tim jî nû ve tîn wergerandin. Ji aliyê din, hin werger ji ber ku şîroveyeke gelek nû bi xwe re tînin, layîqî wergerê tînin. Mesela wergera Qur'anê ya Mihemed Esed (bi Îngilîzî) him li Tirkî û him jî li Almanî hatiye wergerandin. Lê ev tişt helbet îstisna ye. Ji ber sebebên min îzah kirî, divê hetanî ji dest tê, wergêr ji zimanê eslî be, da ku meriv bi rengê xwe, bi şîroveya xwe, bi fehm û feraseta xwe, bi terz û şêweya xwe metnê ji nû va ava bike. Lê carnan ev tişt ne mumkîn e. Gava wergêrên hin zimanan tune bin, meriv mecbûr ji zimanekî din werdigêrîne. Ev îzah ji bo metnên edebî û dînî ne. Metnên teknîkî rihettir û hêsantir in û "wergera ji wergerê" jî ez bîm ji bo wan ne zêde problem e.

**Dilawer Zeraq**

Ger wergeran deqeke wêjeyî be, wekî tercîha zimanî û çandî, heta keys hebe, çêtir e ji zimanê yekem û resen bê kirin. Ev ter-

cîh dê bike ku bi taybetî zimanê çandî yê herdu zimanan bîn rûyê hev û wergêr hay jê hebe ka çanda herdu zimanan çendî ji hev dûr an jî nêzî hev in. Ger wergeran deqeke ji beşên zanistî û teorî û siyasî be, ger derfet tunebe, zimanê duyem dikare were tercîhkirin bi şertê ku bawerî pê hebe ku wergera bi wî zimanî hatî kirin serketî ye.



**Hatice Kılıç**

Divê em bi du aliyan ve xwarê ser mijara wergerê bibin. A yekem ew e ku werger ne bi tenê mijara zimên e. Werger herî pir meseleyeke polîtîk û neteweyî ye.

Ku em biçin destpêka wêjeya modern, em ê bibînin ku werger yek ji wan alavên herî bikêr e bo sazkirina textê kanona wêjeya Ewropayî. Berhemên ku di destpêka modernîzasyonê de ji zimanên Ewropî hatin wergerandin, ne ji bo “pêşxistina” zimên bûn. Ji bo neqilkirina fikra modernîzasyonê bûn. Ji xwe li tu cihî ziman pêş nexistin. “Pêşketin an paşketina zimên”, bi xwe jî nîqaşeke modern a gumanbar e. Bi wan wergeran, kevîrên riya wêjeya serdest hat hûnandin. Mese-la konteksta “Klasîkên Cîhanê” li ser vê bîngê ava bû û bû yek ji wan temînatên berdewamkirina dezgeha kanonîk.

Yanê werger di serî de xwedî armanc û tesîreke lîngûîstîk nîn e. Ew herî pir cîhana ku bi destê zimanê orijînal tê temsîlkirin û şewaza temsîlkirina wê cîhanê neqil dike. Wergerandina berhemekî, qalkirina hişmendî û paradîgmayên neteweyekê ye. Lê ev qalkirin, bi hişekî pasîf nayê kirin. Wergêr wê cîhanê, bi cîhana zimanê xwe diguherîne. Yanê wergêr hişmendî û paradîgmayên neteweya xwe datîne ber ya orijînal û dide xuyakirin. Ji ber vê sedemê, wergêra/ê biserketî ew kes e ku hakim û şopînerê fikr û, bi qalkirina Deleuze, “uslûba” neteweyekê din e. Loma

dizane ku kîjan berhemê, çawa û bo çi werdigerîne.

Li ber vê çirayê em dikarin bêjin ku ji zimanê Tirkî wergerandina romana Rûsan, ne wergerandina romana Rûsan e, wergerandina romana Tirkan e. Ger ku em dixwazin cîhana Tirkan hîn bibin divê em berhemên orijînal ên Tirkî wergerînin. Lê li gorî min ev ne pêwîst e. Ji ber ku em (Kurdên Bakûr) vê cîhanê baş nas dikin û berhemên wan bi zimanên wan dixwînin. Ya herî muhîm, em hewl didin ku zimanê xwe ji bandora zimanê wan bifilitînin. Em hewl didin ku gotara (discourse) wêjeya wan a ku bi perwerdehiya înkâr û îmtiyazê hatiye mijandin hilweşînin.

Em hemû Kurdên çar parçeyê, birîndarên zimanê serdestên xwe ne. Ji ber vê, her çiqas werger û wergera ji wergerê îro bo Îngilîsekî mijareke “edebî” be û ji aliyê polîtîk ve neyê nîqaşkirin jî ji bo Kurdekî wergerên ji zimanên serdestan mijara dekolonîzasyonê ye. Di vê kêliyê de meseleya duyem derdikeve pêşîya me. Îro wergerandina berhemên gelên bindest an jî mînorite, di wêjeyên serdestan da (major) berxwedaneke “mînor” ava dike. Loma divê em di aliyekî de jî zorê bidin ser wergerandina berhemên Kurdî bo zimanên biyanî. Nexasim bo zimanên Ewropî, Farsî, Erebî û Tirkî. Wêjeya Kurdan him bi klasîkên xwe him bi gotara xwe ya nûjen dikare derz li kanonan bixe û têkoşîneke mînor ava bike. Zimanê Kurdî jî dê wê çaxê bikaribe wekhev bûna xwe li hemberî zimanên “bi hêz” îlan bike û ewçax dê bazara Kurdî ava bibe û berfireh bibe.

**Brahîm Ronîzer**

Mebest ji wergerê heke wergera edebî be, lazim e ji zimanê orjînal bê kirin. Ji ber ku di tekstên edebî de pûxte ne çîrok-peyam tenê ye. Bi gelek aliyan ve tekstên edebî xwedî afirandinê ne. Loma jî gava ji zimanê duyem an sêyemîn werger bê kirin, ew xweseriyên tekstên orjînal dê gelek zirarê bibînin. Vêca heke wergerên hatî kirin ne serketî bin, an jî xwedî şaşî bin, gava ew berhem li zimanê duyemîn bèn wergerandin wê şaşiyên wan zêdetir bibin. Ew xweseriyên navborî rast jî hatibin wergerandin, bi wergera ji wergerê ji orijînaliya xwe dibe ku zahf dûr bikevin. Ji ber ku werger bi xwe şirovekirin e û şiroveya şiroveyê êdî gelekî dûrî berhema orijînal e. Axir wergera ji wergerê ji bo berhemên edebî xwedî gelekî dafikan e û dawiya dawî ku bê kirin jî, ew ancex dibe wergereke kepîlaskirî.

Lê dîsa jî gava mirov xwe berde nav hûrgiliyên mijarê, mirov dikare balê bikişîne çeşnên tekstên edebî û hinek fitûyan ji wergera ji wergerê re bibîne. Wate ji çeşnên edebî; li ser meselê helbest, bi ya min qet û qet ji zimanê duyemîn divê neyê wergerandin. Herwiha berhemên ku xweseriyên wan ên teşeyî-zimanî li pêş in, ew jî nabe ji wergerê werin wergerandin. Lê hinek pexşan, çîrok û roman ku peyam û vegotin di wan de li pêş e, çêdibe ji zimanê duyemîn bèn wergerandin. Gava ev bèn wergerandin dîsa dibe ku gelek xisar bigihin berhemê. Ji bo ev xisar bêne mînimîzekirin; qenc e ku mirov bikaribe bide ber tekstê orjînal, an jî bide ber zimanê sêyemîn. Ev rêbaza wergera ji wergerê, divê ji bo zimanên ku kesên pê zanin nînbîn bê tercîhkirin.

**Vahdettin İnce**

Zimanê zikmakî ji dê ye. Merîv bi şîrê dê re ziman jî hîn dibe. Însan di rojekê de mezin nabe, mezinbûna wî bere bere ye. Her diçe şîrê dê têrê nake. Êdî hewceyî xwarina tiştên din e, wek nan, goşt, sebze û fêkî. Wisa jî zimanê dê mîna hestû û wersele ye. Lazim e ew wersele goşt û don û xwîn bigre. Yanî ji dora xwe peyvên, metelokan, stranên, çîrokan dibihîze û pê zimanê xwe xurt dike. Yek ji riya xurtkirina ziman, wergerandina edebiyat, felsefe, destan û hwd. ên ji zimanên biyanî ye. Baştirîn rêbaz ew e ku meriv ji zimanê orijînal wergerîne. Lewra bivê nevê her metna ku tê wergerandin ji wateya xwe, te'ma xwe, ji rêça xwe û ji rihê xwe tiştinan wenda dike. Lê dîsa jî ji ber hinek sedeman wergera ji wergerê jî pêwîst dibe. Wek mînak hinek werger hene ku ji metnê esil çêtir in. Hinek werger ji xwe dewsa metnê orijînal digrin, wê didin ji bîr kirin. Zimanê Kurdî ji ber gelek sedeman, bextreşiyên lawaz û jar maye. Gelek caran qesta mirina wê tê kirin. Lazim e bê axaftin, bê nivîsandin û bi wergeran bê dewlemendkirin. Heta ji dest tê ji zimanê orijînal, ew jî nebe ji wergerê jî dibe. Min wek wergêr herdu rê jî ceribandin, pirtûkek ji Tirkî wergerand Kurdî, çima ku eslê wê Îngilîzî bû û ez jî Îngilîzî nizanim. Yek jî min ji Erebi wergerand. Armanc xurtkirina Kurdî be ew, armanceke pîroz e.





# POP PIRS

# HÊVÎDAR ZANA

Pêşkeşvan û Rojnamevan

Li Nisêbînê ji dayik bûye. Xwendina xwe ya seretayî li Nisêbînê bariye serî. Xwendina navendî û zanîngeh jî bi derengî û bi navberên dirêj, li Holenda û Emerîka Latînî temam kiriye. Ji beşa rojnamevaniyê derçûye. Piştî 18 salên xerîbiyê, ev 6 sal in li Kurdistanê ye û li Tora Medyayî ya Rûdawê pêşkeşvanî û rojnamevaniyê dike.

Peyva ku tu herî zêde jê hez dikî?

Serxwebûn.

Tu dikarî kêliya xwe ya herî bextewar ji me re bêjî?

Ez hîna negihîştîme wê kêliyê.

Tehemula te ji çi re tune ye?

Ji bêedebiyê re.

Te li vê dinyayê herî pir dixwest kê nas bikî?

Ehmedê Xanî

Keyala te ya herî mezin çi ye?

Dixwazim dewletbûna Kurdan bibînim.

Bi xêra xwe hevokeke ji strana ku herî zêde jê hez dikî bibêje.

Kurdistanê Kurdistan bexçê gulên derdê dilan / Îro maye li bin destan barê giran li ser milan.

Çi kenê te tîne?

Kêfxweşiya zarokan

Dengê ku tu herî zêde jê hez dikî?

Xuşexuşa ava çeman

Heke cardin bihatayî dinyayê, te yê çi tiştî cardin bikira?

Rojnamevanî.

Tiştê ku îlhamê dide te çi ye?

Xizmetkirina raya giştî ya Kurd.

Dîmeneke çawa te aciz dike?

Lêdan û destdirêjiya zarokan hiş di serê min de nahêle.

Te dixwest tu li ku derê bijî?

Li Mêrdîna kevin di xaniyekî kevirî de.

Qisûra te ya herî mezin çi ye?

Zêde perfeksîyonîst im. Li dinyayeke tije qisûr li pey rêkûpêkiyê digirim, ne îşê aqilan e.

Tu dixwazî çawa bimirî?

Ez naxwazim şêwaza wê hilbijêrim, hema çawa be jî ne xweş e.

Dixwazî çi li ser gora te bê nivîsandin?

Te çi dît û çi nedît...





# Midbexa Kurdî

## KELEDOŞ



Bahar Çe

Keledoş, di dîrokê de yek ji xwarina herî kevn a Kurdan e ku aydê herêmên Serhed û Botanê ye. Di sala 2017an de hatiye tescîlkirin û wekî Keledoşa Wanê nişaneya taybet stendiye.

Hin deman bi navê Keledoşa Herî Paş pêşbirk jî tên li darxistin.

Çêkirina wê bi zehmet e, tehma wê jî pir xweş e û li ser sifreyên Kurdan cihê wê taybet e.

Çortana ku kereseyeke fermente ye û heliza ku li çolteran ji ber xwe ve şîn tê, ji siheta însên re jî gelekî bi feyde ye.

Ev kereseyên ku tên hilberîn, ji ber proteîna zêde ya di nav wan de, hem cihê proteînên ji kereseyên ajalî girtiye hem jî ji

hêla aborî ve xwedî cihekî girîng e.

Çortana ku exlebê havînan dema ku şîr pir zêde ye tê çêkirin, ji hêla proteîn, kalsiyûm, potasyûm û fosforê ve gelekî dewlemend e.

Ji bo kîloyek çortan were çêkirin pêdivî bi 15 kîlo mast heye.

Lê gelo ev Çortan çawa çêdibe?

Piştî ku şîr hat dohtin û parzinandin, di beroşê de tê kelandin, paşê jî heta ku germahiya şîr bi qasî ku were meyandin kêmbibe tê sekinandin û bi mastê ku berî bi rojekê hatiye çêkirin, tê meyandin.

Mastê ku hatiye çêkirin dixin parzûnên qumaşî û tê parzinandin.

Mastê ku bi temamî tê parzinandin, di testên fireh de tê bicihkirin û piştî ku xwê lê dikin ev mast tê tevdan.

Ev mastê ku hatiye parzinandin, dibin gulok û bi destan tê giroverkirin, li ser qûmaşên paqij tê danîn û li ser banan, li ber tavê hefteyek-du hefteyan tê hişkkirin. Çortan li cihekî hênik û zuwa tê veşartin. Li gorî şertên guncav heke were veşartin,

çortan çend salekî xwe digre û xera nabe.

Li Îranê “kashk”, li Surîyê “jub-jub”, li Iraqê “kuşuk”,

Li Sêrtê “geşk”, li Çewlig, Agirî û Wanê “keşk”, “çorten”, “torak”, “terne”,

Li derdora Mêrdînê jî wekî “çortan” an jî “şurtan” tê binavkirin.

Kashk li Îranê bi awayekî kevneşopîk tê çêkirin û wekî konserveyan bi awayekî mayî tê firotin.

Çortan li herêmên cuda di nav xwarinên cuda de tê bikaranîn;

**Gulol:** Colemêrg

**Xwarina Çortanê:** Wan

**Keledoş:** Wan

**Sengeser:** Wan

**Serbidew:** Cizîra Botan

**Kifta Glori:** Dîlok

**Xengel:** Qers

### Melzemeyên Keledoşê

500 gr. Goştê berxan an jî dewaran ê bêhestî.

4 heb pîvaz

4 heb çortan

Qedeheke avê nok

Qedeheke avê hebnîsk (nîskên kesk)

Qedeheke avê rûn

50 gr. Heliz


Bi qasî hewce dike xwê.

### Çêkirina Wê

Ji bo binê wê; çortanan berî bi şevkê, di nav ava ku hema bi ser wan bikeve, bisekinînin. Ava di ser çortanên ku nerm-bûne de birijînin û dîsa bi qasî ku av bi ser wan bikeve, avê berdîn ser û wan çortanan bikin wekî mast. Di beroşên cuda de, nok, nîsk û helizê bipijînin. Hemû kereseyên ku pijîyan, bixin nav çortanê û wan bi hev re bipijînin.

Ji bo tiştên li sere; Goştê xwe di beroşekê de bikelînin û dema ku zuwa bû, rûn û pîvazên ku we hûr kirine, berdîn ser goşt û biqelînin. Hinekî xwê biavêjin ser goştê qeliyayî û ocaxa xwe bigrin.

Ewilê têkelhevîya çortanê bixin teyfikê û paşê jî goştê bipîvaz deynin serê. Noşî-can be.





## Midbexa Kurdî

# Girar an jî Mehîr



Mamoste Bêrivan

Silav û hurmet ji we hemû xwînerên POPKURD'ê re.

Ez difikirim, ger Adem ew sêv gez nekir, belkî me evqasî ji xwarinê an jî xwarinan hez nekira.

Ya rast, baş e ku ev heza însan heye ku bi saya wê, xwarinên foqiladet û bitehm çêdike.

Paulo Coelho wiha gotiye: “Hunera herî xweş û bêqisûr, çêkirina xwarinê ye. Em bi hemû laş û eqlê xwe, xwe didin ser wê xwarinê. Di midbexê de lazim e çî ji destê te bê tu wê bikî. Tedawiya herî baş, bo min ev e.”

Camêr rast gotiye, heta ji orta Qur'anê xeber daye. Di van rojên Koronayê de ez bawer im her kes ket midbexê, xwarin û terîfên nû ceribandin. Eza mamoste ku min

her roj ji xwendekarên xwe re qala hoker û lêkeran dikir, ha min dî ez ketime midbexê. Wekî gelek kesan, min jî ev tedawî hilbijart û berê xwe da midbexê.

Gava min pîvaz hûr kir û hevîr vekir qabiliyetên xwe yên midbexê keşf kir. Min ferq kir ka ez dikarim çî bikim û çî nekim. Wekî gelek kesên ku hez ji çêkirina xwarinan dikin, ez jî tim li pey tiştên nû me.

Min ji xwe pirsî; Ez çawa dikarim ji tehmên klasîk tiştên nû çêbikim. Li ser vê pirse; ez ê îro ji we re qala Girar an jî Mehîrê bikim û li gorî xwe, terîfa wê ji we re bêjim. Ev şorbe di midbexa Kurdan de xwedî cihekî taybet e û hema bêje li her herêmê tê çêkirin.

Hewce ye em vê jî bibêjin ku li her herêmê bi şeklekî cuda tê çêkirin.

Min dîtiye ku hin kes becanê reş û kundir jî xistine navê lê ez vê tercih nakim ya rast, ne li gorî tehma deve min e.

Ez kine-rê li mesele bixim; Şorbeya Bêrivanê him ji hela hezimandinê ve him jî

aliye freşiya xwe ve xweş e. Herwiha ji ber ku bi hêsanî tê çêkirin, hûn dikarin havînan cemidî, zivistanan jî bi germî çekin û vexwin. Ez ê niha derbasî terîfê bibim, ez bawer im heçiyê ev terîf yek bi yek pêk bîne wê şorbeyeke zehf zehf bitehm vexwe.

### Melzeme:

500 gram mast

Bi qasî 2 îskanên avê, dan

Bi qasî îskanekê, nok

Bi qasî îskanekê, gilgil

4 heb xiyar

3 serî sîr

Bi qasî îskaneke çay, zeyt

Bi qasî îskaneke çay, av

Nîv baq "Dere Otu"

Nîv baq neneya teze

Û Xwê

### Terîf:

\* Nokên xwe dane xwe ji hev cûda bi-heşinin, pişt re bihêlin bila sar bibin.

\* Hêşinahyan zirav zirav hûr bikin û wan tevî nok, dan û gilgilan bikin û gişan bixin qabeke kûr.

\* Sîr û xiyarên ku we rende kirine bixin ser wan û mast tevî bikin.

\* Li ser van hemûyan av, zeyt û xwêya xwe zêde bikin û heta ku giş dibin yek, li hev bixin. Paşê şorbeya xwe têxin dolabê.

\* Bila 2 saetan di dolabê de bimîne, pişt re şorbeya we hazir û amade ye.

Ez dikarim vê jî bibêjim ku terîfa herî nêz a şorbeya min, Mehîra Diyarbekiriyana e. Ferqa ya mine w e kum in Gilgil, Hêşinahî û xiyar xistin nav şorba xwe û ew kir freş.

Ka hela hûn jî biceribînin bê ka hûn ê jê hez bikin an na...

Bimînin di nav xêr û xweşiyê de...



# Kurtepist

## HEZ-KURD HEZIYA

Hereketa Zimanê Kurdî (HEZ-KURD), çend meh berê bi hêvî û omdiyên mezin ava bû. Lê piştî demekê di nav hereketê de, derbarê rêvebiriyê de problem derketin. Barij Celalî, tevî hin endamên hereketê daxuyaniyek da û got “Kesê di rêvebiriyê de be, divê miheqeq bi Kurdî zanibe. Loma jî me biryar daye ku birêz Fewzî Bulgan di rêvebiriyê de cih negre.” Fewzî Bulgan jî li ser vê yekê wiha got: “Eva daxuyaniyeke korsane u em vê qêbul nakin.”



## GELO EW QRAL KÎ YE?

Roşan Lezgîn, demek berê, li ser bloga xwe nivîsek belav kir. Tê de wiha got: “Qralekî muxterîs ji Ewropayê hat, li ser potansiyela hazir rûnişt û got ‘Ez Celadet Bedirxanê Zazayan im. Her kes ji paltoyê min derketiye.’ Vêca her kes meraq dike ka Lezgîn, di vê nivîsê de behsa kê kiriyê û bi van gotinan qesta wî kî ye? Heçiyê bersivê bizanibin ji kerema xwe bila ji ser mailê, xwe bigihînin me.

# TENBÛRA YARSAN



Shahab Valî

Berî afirandina mirovî, Tenbûr hebû  
 “Şa wat melean çenî ve zatê pîr  
 Ew qebzeyê xak bikin ve xemîr  
 Xak tiyar in xemîr jîş bisaz  
 Ayim îcad ken ve sidq û niyaz  
 Ve çuwar ‘enasir xemîrîş saxtin  
 Ve şiklê Mewlam qalibiş saxtin”

Di beytên jorîn de, Xan Elmasê Loristanî ( s.s.17) behsa mîta antropogonîk yan jî afirandina yekemîn mirovî dike. Li gorî mîtolojiya Kurdên Yarsan, Xwedê piştî afirandina yekemîn mirovî ji ruhê xwe pîfî ruhê wî kiriye lê ji ber ku laşê mirovî ji axê bûye ruhê îlahî nexwestiye têkeve bedena wî. Wê demê li ser emrê Xwedê, firîşte “meqamê Terz”, ku meqamekî navdar e di nav Yarsanan de, lê dide ji bo ku Zatê Îlahî têkeve bedena vî kesê yekemîn. Her wiha Zatê Îlahî bi reqs tê û bi dengê tenbûrê dikeve bedena vî kesê yekemîn.



► Nîgare: Firîşteyek ku tenbûrê lê dide.

Ew riwayet girîngiya tenbûrê ya di nava bawerî û jiyana Kurdên Yarsan de nişan dide. Ji bo Kurdên Yarsan Tenbûr ne tenê amûreke musîqayî ye, belkû hebûnek asimanî ye ku yekem car ji aliyê firîşteyan ve hatiye lêdan. Ji ber wê jî wek “Nî-daul-Heqq” yanî dengê heqîqetê hatiye binavkirin.

Di coxrafyaya Îranê de, wek amûr, tenbûr xwedî tarîxeke zêde kevin e. Neqşên li ser kevirên aidê serdema berî Partîyan yan jî serdema wan û Eşkanîyan, dîroka kevin a tenbûrê ya di nav xelkên coxrafyaya Îranê de isbat dikan. Yanî wekû Seyid Xelîl Alîni-jad, mamosteyê navdar, gotibû: “tenbûr, qelenderek tenik e ku xubara hezaran salan li ser milên xwe radikişîne”.

Tenbûr, bi cureyên cuda cuda, di dîroka musîqaya dinyayê de amûreke nasrav e. Lê li vir em ê behsa wê tenbûrê bikin ya ku wekî “tenbûrê Yarsan” tê nasîn. Wekî me di destpêka nivîsê de jî diyar kir, li gor rivayetên Kurdên Yarsan, tenbûr cara ewil ji aliyê firîşteyan Xwedê ve hatiye lêxistin, piştî cara ewil di sedsala 11ê de Şah Xweşîn, ku di bawerîya Yarsanan wekî teciya Xwedê tê qebûlkirin, ev amûra pîroz wekî amûreke aidî xwe hilibijartîye.

Li gor bawerîya Kurdên Yarsan, Şah Xweşîn ayîneke mezin li dar xistiye û ji alîgirên xwe kom çêkirine, ku ev kom wek nehse nehse tene binavkirin. Her komê li amûreke cuda xistiye, lê Şah Xweşîn ji bo xwe û ji bo koma xwe ya nehse tene hilibijartîye û piştî firîşteyan cara ewil wî rahiştiye tenbûrê. Ji ber vê ev amûr di kevneşopiya Yarsanan de wek Sazê Şah Xweşînî tê binavkirin.



Dîsa li gorî kevneşopiya Yarsanan, Şah Xweşîn beriya ku kirasê xwe biguherîne, ji firîşteyên xwe re dibêje: “Hûn ê bigerin û li cihê ku dengê tenbûra min bilind bû, ez ê li wir zuhûr bikim.” Firîşte demeke dirêj digerin, li nav eşîra Cafan, li gundê Sergetê, li mala Şêrxan dengê tenbûra Şah Xweşîn seh dikin û dizanin ku wextê zuhûra Xwedê hatiye û Xwedê wek Baba Nawis li wir zuhûr dike.

Bi vî rengî li cem Yarsanan tenbûr wekî amûreke pîroz tê dîtin, û ne tenê ji aliyê baweriyê we belkû di jiyana rojane de jî, tenbûr xwedî cihekî pir taybet e. Kurdên Yarsan bi piranî li tenbûrê didin û em dikarin bêjin ku li her maleke Yarsaniyan tenbûr peyda dibe. Rêzek mezin li ber vê amûrê tê girtin, beriya lêxistinê tenbûr tê maçîkirin. Kilamên pîroz ên Yarsanan bi tenbûrê tîn gotin û kesên mezin ên Yarsanan kelimên xwe bi tenbûrê dibêjin. Di ayîna Cemê de, di cejn û taziyeyan de jî tenê tenbûr tê bikaranîn.

Di tenbûrê yarsanan de pîvana muzîkê wek meqam tê binavkirin û cureyên cuda yên meqaman hene. Em dikarin muzîka tenbûrê ya Yarsanan wiha dabeş bikin:

1. Meqamên dînî yan Heqqanî ku wek “kilam” tîn binavkirin: Meqamên heqqanî aîdî ayîna Cemê ne û icra kirina wan ya li hember kesên ne Yarsanî qedexe ye. Kilam bi xwe du

cure ne: Meqamên ku bi solo ji aliyê kilam-xwan tîn icrakirin û meqamên komî ku beşdarên ayînê jî tevî icrayê dibin. Li gor kevneşopiya Yarsanan, hejmara meqamên Heqqanî 72 ye.

2. Meqamên Bastanî (Kevin): Meqamên ku li civînên ne fermî yên li hember kesên ne Yarsanî, bi rêzgirtinî, dikarin bêne icrakirin.
3. Stranên nû ku ji aliyê muzîkjenan ve tîn çêkirin.
4. İcra yê solo.

Li gor şêwaza lêdanê, em dikarin behsa du ekolên tenbûrê bikin. Ekola Sehne (Bajarekî nêzîkî Kirmaşanê) û ya Goran.


Tenbûr heta salên 1970yî di nav xelkên ne Yarsanî de nasrav nebû. Lê di salan 1970yî de bi çêbûna koma tenbûrê ya bi navê “Sehne” ya ji aliyê mamosteyê navdar Emrula Şah İbrahîmî, tenbûr li Îranê hat naskirin. Piştê bi hewldana kesayetê karîzmatîk ê Yarsan, Seyid Xelîl Alînijad, ku di sala 2001ê de hat kuştin, û bi dengê Şehran Nazirî, tenbûrê Yarsanan li hemû Îranê û piştê li hemû dinyayê hat naskirin û ew amûr bû beşek ji nasnameya Yarsanî.

Mamosteyên rastîn ên tenbûrê yarsan li gundan dijîn û bi piranî ji aliyê kesên ne Yarsan ve nayên naskirin. Çend nimûne ji mamosteyên xwedî şêwazê tenbûrê:



► Koma tenbûrê Sehne 1975, ji aliyê rastê we:


Qasim Heqîqet Nijad, Yehya Re'nayî, Feramerz Re'nayî, Me'sûm Şerbetî, Seyid Xelîl Alînijad, Celal Mihemediyân, Hebib Şah İbrahîmî, Nadir Nîkrû, Erselan Nîkrû, Ferûx Heqîqî.




► Seyid Emrula Şah İbrahîmî. Mamosteyê herî nasrav di ekola Sehne de.



► Seyid Welî Hiseynî. Efsaneyê tenbûrê ekola Goran.



► Mamoste Elîmîr Derwêşî, ji ekola Goran.



► Mamoste Seyîd Xelîl Alînijad, ji ekola Sehne.



► Mamoste Tahir Yarweysî, efsaneyê tenbûrê û mîratdarê meqamên kevin, ku sala çûyî koçî dawî kir, ligel şagirtê xwe yê herî baş, Hemîd Şemsniya û Shahab Vali. Goran 2006

ROPORTAJ

# HINÊR SALEEM

“EZ DI NAVBERA EDEBIYAT  
Û SÎNEMAYÊ DE MAME”



Roportaj:  
Omer Bextiyar

Dema li cîhanê behsa sînemaya Kurdî tê kirin bêguman di serî de du-sê navên wek; Behmen Qubadî û Hinêr Saleem tînin gotin. Lewra sînemaya Kurdî piştî salên 2000an bi saya van derhêneran, li cîhanê belav bû û xwe li cihana sînemayî da qebûl kirin. Derhênerê başûrî yê bi nav û deng Hinêr Saleem, ev nêzî 30 sal in li Fransayê dijî. Me jî bi Hinêr Saleem re bi riya vidyokonferansê, li ser sînemaya wî, li ser rewş û pêşeroja sînemaya Kurdî û li ser xebatên wî yê nû roportajek çêkir. Saleem, derheqê xebatên xwe yê nû de bo POPKURD'ê axivî û çend mizgînî jî dan. De kerem bikin.

### “Ez wek Kurdekî hatim Tirkîyê, ne wek Spenyol û Fransiyekî!”

-Te herdu filmên xwe yên dawî Tight Dress (“Kirasê Teng”-2016-) û Lady Winsley (“Kê Xatûn Winsley Kuşt?”- 2019-) li Stenbolê bi lîstikvanên navdar ên Tirkîyê re kişandin. Li welatekî wek Tirkîyê bi lîstikvanên navdar re çêkirina van herdu filman, di ezmûna te ya sînemageriyê da teqabulî çî dike?

**Hinêr Saleem:** Helbet mirovekî Kurd bi giştî, peywendiyêke taybet heye ligel Tirkîyê. Lewra ez bi xwe Kurd im û gava tîm Tirkîyê nikarim wek Spenyolî, Portûgalî, yan Brezîliyêkê lê binêrim. Tirkîye gelek taybet e, bi xweşî û nexweşî, di zakîra (bîra) muşterek a hemû Kurdan da heye. Ez bawer dikim ku Kurd û Tirk mecbûr in baştir diyalogê bikin û ji hevûdin têbigihêjin. Gelekî girîng e ku mirovên Tirk, êş û azarên bi milyonan mirovên Kurd; zarok, jin, gênc û hunermendên Kurd fêm bikin, hest pê bikin. Lewra dema ez tîm Tirkîyê; karekî dikim, filmekê dikşînim; ez nikarim wekî însanekî dûrî van probleman bimînîm. Wekî Yehûdiyêkî ku di salên 1938an da biçe Almaniyayê û filmekê bikşîne. Yanî peywendiyêke taybet heye. Lê me gelek tiştên muşterek anîn holê. Her roj min heyecanek hebû. Heyecan ne tenê ku ligel aktorên Tirk kar dikim. Dibêjim Tirk, lê bi eslê xwe mirovên Tirkîyê yanî. Lewra Tirkîye welatekî mozaîk e. Kes nizane eslê wî çî ye, qewmê wî çî ye. Helbet ez bi pozîtîf û bi hurmet dibêjim. Lewra ez li vî welatî filmekê çêdikim. Lê bêguman min heyecanek taybet hebû.

### “Bi sansurê filma min seqet kirin”

-Herwiha filma te ya “Tight Dress” li Tirkîyê rastî hin bertek û rexneyên wekî; “derhênerê Kurd ê Iraqî bi çavekî oryantalist Tirkîyê nîşan daye” jî hat. Heta ligel ku aktrîsa Tirk Tuba Büyüküstün yek ji çêkerên filmê bû jî, film encax piştî 3 salan (2019) li Tirkîyê li televîzyoneke taybet (Star TV) hat nîşandan. Li ser vê meseleyê tu dixwazî çî bibêjî?

**Hinêr Saleem:** Bi rastî boykot û qedexekirin li ser vê filmê çêbû. Çimkî civaka Tirkîyê fêr nebûye ku mirovek bi çavekî rexneyî li civaka wan mêze bike. Zêdetir tiştên ku li Tirkîyê li ser sînemayê çêdibin yan ji bo propagandayê ne, yan jî ji bo zarok û gêncan; filmên kêf û komediyê tîm kişandin. Xelkê Tirk hez dike xwe wek Ewropî bibîne û dixwaze xwe bide bawerkirin ku çî problemek li vir tune ye û komelgeheke laîk, sekuler û lîberal e. Bêguman însanên lîberal û ilmanî hene, lê bi dîtina min; bi giştî civakeke konservatîf û parêzer a Îslamî ye.

Bedaxewe, bi krîtîkên sînemayî jî, li xweşa wan neçû ku kesek ne Tirk, were welatê wan û bi filmekê; rexneyan li civaka wan bigre. Lewra ew pir hez dikin ku bibêjin welatê wan bihuşt e. Dubare dikim; hurmeta min ji hemû miletan re heye. Em hemû mirov û însan in, meseleyên siyasî tiştêkî din in. Bi kurtasî, ji bo wan surprîz bû û wan bawer kir ku bi vê filmê, wê wêneyekî negatîf ê civaka Tirkîyê li dinyayê belav bibe. Herwiha hindêk ji wan aktoran gelek tirsîyan. Lewra gelek aktor li rêzefilmên televîzyonê kar dikin. Berpîrsên televîzyonan gotine, ger hûn qebûl bikin, em ê kontratên bi we re betal bikin. Dirêj nekim, film rengêk ji rengan hate qedexekirin. Paşê ev film, dema li televîzyonê hat nîşandan, 20-25 deqeyê filmê li gorî dilê xwe, meqes lê xistin û birrîn. Bawer dikim piştî vê; bedewî, qewet û maneya filmê qels bû. Çimkî film seqet kirin. Ew tiştên ne bi dilê wan bû avêtin. Helbet ev jî nîşan dide ku hê jî li wî welatî problemên kulturî, dînî, siyasî û mental pir in.



► Ji filma nû ya Hinêr Saleem

**“Her civak li gorî pêşveçûna xwe ya hizrî û demokrasiyê li karên hunerî dinêre”**

-Li gorî te çima piştî 3 salan li Tirkîyê ev fîlm dan nîşandan? Haya te ji vê meseleyê hebû, tu bi wan re ketî peywendiyê yan prodaktor çareser kir?

**Hinêr Saleem:** Bi rastî ez teferuatên wê nizanîm. Lê tiştê dizanîm hîlbijartinên şaredariyan çêbûbûn. Eynî şev an şeva piştî wê, fîlm nîşan dan. Nizanîm çî peywendî bi tiştan wisa re heye yan na. Jixwe zêde min enterese jî nake. Karê min ew e ez fîlman çêkim. Hin fîlmên min dibirrin, zibil dikin û nîşan didin, hin jî wan nîşan didin û li cîhanê belav dikin. Êdî her civak, welat û mueseseyek, li gorî pêşveçûna xwe ya hizrî û demokrasiyê li karên hunerî dinêre.

**“Ez lîstikvanan hildibijêrim, ne zarava û devokan”**

-Te di filma xwe ya “My Sweed Pepper Land” (2013) de, cih da 3 zaravayên Kurdî. Ne şaş bim filma te, yekem filma Kurdî ye; ku Kurmancî, Soranî û Zazakî bi hev ra hatiye axaftin. Û we piçêkê jî, rastîya dîyalektên Kurdî wêdetir daye nîşandan ku her kes ji hevûdin baş fêhm dikir. Sedema vê yekê çî bû gelo, te xwest bi vê yekê çî peyamê bidî? Em dikarin bêjin ev xeyala Hinêr Saleem e ku her Kurdek bi zaravayê xwe biaxive û ji hev têbigihîje?

**Hinêr Saleem:** Li ser vê ez ê du tiştan bibêjim. Ya yekê ev e; bawer dikim her Kurdek, eger Kurdî bizane, yanî xwendina rewşenbîriya Kurdî li ba wî hebe, dikare ji hemû Kurdî fêhm bike. Bila her kes jî bi devoka xwe bipeyive, ev ne problem e. Bo nimûne; ez Bahdînî me û cenabê te jî Serhedî ye û em baş jihevûdin fêhm dikin. Her Kurdek bi devoka gund, mintiqe, bajar û devera xwe biaxive, problem nîn e.

Ya duduyan; Di fîlmên xwe da ez akter hildibêjîm, ez devoka ku ekter dipeyîve hîlnabijêrim. Ji bo min bi Feylî, Kirmanşahî, Colemêrgî an bi Zazakî, an bi Silêmanî dipeyive ferq nake. Ji bo min hemû Kurdî

ne û wekî hev in. Li aliyê din jixwe ewqas akterên Kurd nîn e ku wek nimûne, ez bêjim fîlmekê ez ê li Hewlêrê bikşînim û divê bi devoka Hewlêrê biaxive. Hemû Kurdên dinyayê, heta Kurdên li ser roj û heyvê kom bibin ancax tu dikarî pê fîlmekê bikşîni. Mirov bêje ka ez fîlmeke devokî çêkim, Bahdînî an Hewlêrî bikşînim, mirov nikare bike. Lewra êdî min ev problem di hiş û wijdanê xwe da safî kirîye. Gava fîlmekê çêdikim, lê dinêrim ka akter baş e yan na. Eger baş be, ne girîng e bi kîjan devokî diaxive.

Li aliyê din, bazara sînemaya Kurdî bo kesekî wek min nîn e, sifir e. Tevahîya fîlmên min ne li sînemayê, ne li kanalan tîn nîşandan ne jî CD -DVD'yên wan tîn kirîn û firotin. Û diyasporaya Kurdan jî li Ewropa, li Emerîka û Awîstralayayê, ji sedî yek jî naçe sînemayê û fîlmên min temaşe nake. Lewra bazara min zêdetir Parîs, London, NewYork, Filîpîn û Awîstiralyayê ye. Ne Diyarbekir, Duhok, Silêmanî û Sine ye. Yekî Fransî an Japonî bizane ev zimanê Kurdî ye, bes e. Lewra ew nizane bi kîjan devokî ye. Ji loma jî di fîlmên min de tu girîngiya devok û zaravayê nîn e.

**“Li Tirkîye û bakur bo nîşandana fîlmên min astengiyên siyasî derdixin.”**

- Tu dibêjî li Kurdistanê bazara sînemaya min nîn e. Bo çî tune ye, sedemên wê çî ne?

**Hinêr Saleem:** Li Kurdistanê tune ye çimkî wek nimûne; li mezintirîn parçeyê Kurdistanê, li bakur astengiyên siyasî hene. Him ji aliyê Tirkan ve him jî ji aliyê hindêk grûban ve; ku eslê xwe bi etnîk Kurd in, lê bi mêjî gelek dûrî Kurdan û demokrasiyê ne lê mixabin kontrola jiyana siyasî û kulturî ya bakurê Kurdistanê dikin. Ev siyaseta bêtolerans a Tirkan a li hemberî milletê Kurd û ew grûbên Kurd nahêlin ku fîlmeke Hinêr Saleem belav bibe. Yanî çawa aliyên ne demokrat ên dewletê nahêlin, aliyên ne demokrat û yên antîKurd ku bi esil Kurd in jî, nahêlin fîlmên min bîn temaşekirin. Lewra ew grûb dixwazin yên militan û dîn, yên bêaqil li gel wan bin û tiştên wan belav bikin.

Pekî, li Ewropa û li welatên derveyî Kurdistanê çima Kurd naçin filmên min? Li Elmanya û Fransayê diyasporayê gelekî mezin a Kurd heye. Mesela filmeke komedî ya Tirkan derdikeve, bi hezaran Kurd diçin temaşe dikin. Lê dema filmeke Hinêr Saleem derdikeve ew naçin. Heqê wan e tabî, dema filmê temaşe 'kin û li xweşa wan neçe, ev normal e. Lê nedîtine û naçin jî. Ez bawer dikim ji ber vê ye; divê mirov psîkolojiya miletên bêdewlet û kêmbîneyan fêhm bike. Dewletên dagirker wisa dane bawer kirin ku Kurd nikarin tiştên xweş û baş çêkin. Psîkolojiya Kurdên diyasporayê jî bi taybetî yê karker û feqîr û bê kultur jî wiha ye; ew bawer nakin ku Kurdek filmeke xweş çêke. Bawerî bi xwe nemane. Lê dema filmeke piyasayê ya Tirkîye û Îranê derdikeve ew diçin temaşe dikin. Ev, problemeke psîkolojîk a miletê mezlûm e ku 80 sal in ew bêqîmet kirine yan hatine bêqîmet kirin.

### “Ez Kurd im û ewqas”

- Li ser sînemaya neteweyî her çiqas terîfeke objektîf û teqez tune be jî, ji bo sînemaya Kurdî, ji ber rewşa Kurdan û Kurdistanê ziman, hêmana herî sereke dixuye. Du filmên te bi Tirkî hatine kişandin. Ji bo derhênerê Kurd, çêkirina filmeke bi zimanekî din, tecrubeyeke çawa bû û di sînemayê de ji bo te zimanê Kurdî çiqas girîng e?

**Hinêr Saleem:** Di vir de Hinêr Saleem du kes e. Yek; di jiyana xwe ya normal de ez Kurd im û welatê min azad nîn e. Lê gava ez sînemayê çêdikim ez ne Kurd im, ez mirov im û ez xelkê vê dinyayê me. Ya girîng ew e ku mirov karekî bedew çêbike. Ger em bi Yehûdîyan ra miqayese bikin, mesela filma Steven Spielberg a “Lîsteya Schindler’s” (Schindler’s List-1993) ne bi Îbranî ye ne jî bi zimanê din ên Ewropaya Rojhilat e, bi Îngilîzî ye. Gelek nivîskarên Yehûdî bi Elmanî, Îngilîzî, Frensî, Îtalî yan bi Tirkî, bi gelek zimanan nivîsandine. Ev, ne tiştê girîng e. Lê ya girîng ev e, çi dinivîsîn û di dawiyê de ji bo mirov û miletê

wan çî xêr tê de heye. Lê her kes dibêje Steven Spielberg Yehûdî ye, yan filankes Yehûdî ye û edebiyateke Yehûdîyan heye.

Li gorî min tiştê heye bo Kurdan gelek girîng e ku em li serê bifikirin. Herçiqas sînorekî me yê siyasî û azadiya siyasî tune be jî, mirov dikare serxwebûna miletê xwe jî aliyê moral û rûhî de çêbike. Di mêjiyê xwe de dewleteke serbixwe ya Kurdî ava bike ku miletê Kurd tê de azad e. Ez bi vî çavê dinêrim. Ez filman çêdikim, ne ji ber ku Kurd im. Tesaduf ku ez Kurd im. Ez jî sînema, huner û edebiyatê hez dikim. Ez ne serbilind im ku ez Kurd im, ne jî serşor im ku ez Kurd im. Ez Kurd im û ewqas. Ez Japonî yan Tirk bûma jî min ê eynî tiştî gotiba. Ez şermê nakim û tiştêkî wisa jî nabêjim ku ez pê serbilind im. Mirovatî gelek çûye pêş ku divê însan fikrên wiha paşvema li pey xwe bihêle. Mesela dema ez filmeke çêdikim rojname û kanalên Ewropî dibêjin, Hinêr Selîm derhênerê Kurd e, ev bi xwe jî xêreke xwe heye bo Kurdan. Wekî din, çîrok û naveroka filmên min pirî caran li ser Kurdan in. Wextê dibêjim Kurd, qesda min siyaset nîn e, eşq e, xwarin e, muzîk e, spor e, resm e, hezar tişt e. Bo nimûne, filma min a dawî li kanala Frensî Kanal Plusê, 28 caran hat nîşandan. Fîlm yekem car li “prime team”ê hate temaşekirin, hema bêje 4 milyon însanan ew dît. Dema tu van didî ser hev, yanî bi kêmanî 2 saetan Hinêr Saleem çûye nav mala Frensiyan û bi çavê Hinêr Saleemî ji bo Frensiyan bi xweşî, nexweşî, êş û azar, komedî, eşq, zilm, seks, xwarin û vexwarinê, behsa Kurdan kiriye. Ev bi xwe tiştêkî gelek baş e.



► Hinêr Saleem li gel serlîstikvana filma xwe ya dawî

**“Zimanê filmê na, başiya filmê girîng e”**

-Dubare ez ê mijara zimên ji cenabê te bipirsim. Di sînemaya Kurdî de nîqaşên li ser bikaranîna zimanê Kurdî gelek aktuel e. Bo nimûne; li ser hin filmên Yilmaz Güney; hê jî nîqaş hene, ka malê sînemaya Kurdî ne an na. Ji loma jî, li gorî te ziman bo ku filmekê bike malê neteweyekê, çiqas girîng e?

**Hinêr Saleem:** Başiya filmê jî girîng e. Helbet baş e, xweş dibe ku endustriya sînemaya Kurdan hebe û ji bo li Kurdistan û cîhanê bazareke bi Kurdî çêbe. Le eger mimkun nebe ku derhênerê bi Kurdî çêbibe, bo min ne problem e. Çimkî Yehûdî 2 hezar salan ji zimanê xwe hatibûn qutkirin. Heke Kurd bîaqil bin, zimanê wan qedexe jî be û yek milyon Kurd jî bi zimanê xwe nizanibin, wê rojekê zimanê xwe zindî bikin. Lê heger Kurd nefehm bin; Kurdî biaxivin an neaxivin jî, dê Kerkûkê jî Diyarbekirê jî bifroşin.

**“Ez pir dixwazim filmeke tirsê çêkim”**

-Niha filma te ya “My Sweed Pepper Land” di sînemaya Kurdî da yekem filma kovboyî, Westernî tê hesabandin. Di sînemaya Kurdî da em zêde hînî vî cureyî nebûne bi rastî. Tu bo çî filmên wiha pir rengî dikşînî? Yan jî ez wiha rasterast bipirsim; Hinêr Saleem di sînemaya Kurdî da dixwaze çî pêk bîne?

**Hinêr Saleem:** Eger min cewaba vê zaniba jiyana min wê pir xweş û rehet bûya (dibişire). Ez her ji xwe dipirsim; Hinêr Saleem tu çî dixwazî? Lê her carê çîrokek, hikayetek, wêneyek, risteyek, cumleyek; fikrek û heyecanek di serê min da çêdibe û hez dikim wê bikim film. Û ez ji şeweyên cuda cuda hez dikim. Heyecana min bi wê tê; ez tiştekî bikim ku min berê wê nekiribe. Rîsk tê de hebe û ez nizanibim. Ev entresan e.

Ez ji hemû şeweyên sînemayê hez dikim. Yekem filma min komedî ye. Dram, komedî, ekşin, western; ez ji gişan hez dikim. Mesele niha ez pir dixwazim filmeke tirsê çêkim.

**“Bo Kurdan şoreşa seksê pêwîst e.”**

► Ji filma nû ya Hinêr Saleem

-Di filmên te de, mijara zayendîtî/cînsîtî jî heye. Te di sînemaya Kurdî zêdetir bi mefhûmên mirin, sînor û xizaniyê tijî ye. Bi taybetî di filma te ya “My Sweed Pepper Land”ê de mijara evîndariyê ji mijarên din zêdetir derdikeve pêş û her wiha sehneyeke hevşabûnê jî tê de heye. Heta te di hevpeyvîneke xwe da gotibû; “Ji Kurdan re şoreşa seksê lazim e.” Ji kerema xwe dikarî hinekê behsa vê mijarê bikî?

**Hinêr Saleem:** Di filma min a nû de ku niha li ber xilasbûnê ye, sehneyeke dûvdirêj a seksê ya bûk û zava heye. Min ev film li başûrê Kurdistanê kişand. Yek; Kurd wekî hemû mirovan seksê dikin, maçan li hevdû didin, îxanetê dikin, aşiq dibin, ev tiştekî pir bedew e. Erotîzm tiştekî din e. Ez behsa erotîzm û seksa ku bo çîrokê pêwîst e dikim. Ez nabêjim, “Ez Kurd im û şerm e, civaka min qebûl nake.” Min ev merhele derbas kiriye. Ez wekî xelkên din, wekî xelkê Fransî û Kolombîyan li Kurdan dinerim. Çîrok pêwîstî bi seksê hebe, seks heye. Lê ji bo Kurdan şoreşa seksê pêwîst e. Bo çî? Lewra problema herî mezin a civakên mîsîlman, bi taybetî jî yên Rojhilata Navîn ku ez jê re dibêjim “Reşhilata Navîn”, şoreşa seksê pêwîst e. Meyzêne; mîletê Kurd, ji sedî 50 jin in. Lê jin dût xistine ji xebatên kulturî û siyasî ya jib o azadiyê. Ji sedî 50 endamên civaka Kurdan mêr in û em bêjin ji sedî 30yê mêran oportunist in, hez dikin Kurdistan azad bibe lê taqet nîn e mala xwe wêran bikin bo vê meselê. Ma ji sedî 20. Ji vî jî sedî 20ê mêran jî, ji sedî 15 ceşî in. Ji sedî 5 dimîne ku hazir in fidakariyê bikin. Ê baş e, tu yê çawa mîletekî rizgar bikî eger tenê ji sedî 5ê hêza wî mîletî, xebata ji bo azadiyê bike? Giş girêdayî seksê ye. Wekî ku aqilmendekî digot, “heger şerefa mêran di nav lingên jinê de be, ma şerefa jinê li kû ye?”



## “Ez di navbera edebiyat û sînemayê da mame”

- Hinêr Saleem bi nivîskariya xwe jî tê zanîn. Kitêba te ya “Tivinga Bavê Min”, ji bo Tirkî hat wergerandin. Weşanxaneya Avestayê ew çap kir û kêfa xwîneran gelek jê re hat. Gelo tu hêj dinivîsî û li gorî te têkiliya edebiyat û sînemayê çi ye, çawa ye?

**Hinêr Saleem:** Têkiliya edebiyat û sînemayê organîk e, bi hev ve girêdayî ye. Ne tenê edebiyat û sînema hemû tiştên jiyane bi hev ve ne. Hunermend di karê xwe yê hunerî de, hemû vê dewlemendiyê tîne pêş çav. Yanî gelek pêwîst e. Çimkî edebiyat mirov dewlemend dike, fikr û hizrê dewlemend dike, mêtîyê mirov vedike. Hindik tiştên zîhnî ku mirov qet li serê nefikiriye bi xwendina romanekê mirov wan hîsan di xwe de keşif dike. Baştir ji dinyayê fêhm dike, baştir xweşî û nexweşiyên jiyane fêhm dike. Lewra edebiyat stûneke esasî ye ji bo sînemayê û bi giştî jî ji bo huner û jiyane.

Gelek caran fikrek bo min tê, dixwazim bikim roman, lê paşê dibe senaryo. Lê gelek caran jî ez bi xwe bi xwe dibêjim, xwezî çi kes pere nede min, ti şîrket min qebûl neke ku mecbûr bim roman binivîsim. Lê heycana sînemayê wisa xurt e ku gava fikrek hebe bo filmê, zûbizû divê ez prodûktoran peyda bikim û filmê bikşînim. Yanî ez di nava du agirên luks û xweş de me. Di navbera edebiyat û sînemayê de mame. Lê ez gelek gelek aşîqê resm û tabloyan im. Ez hez dikim li dinyayê bigerim û tabloyan bibînim.

-Li dîwarê pişt te tabloyên cuda cuda yên xweş xuya dikin jixwe. Bala min jî kişand. Gelo qabilîyeta we ya çêkirina tabloyan heye?

**Hinêr Saleem:** Ez pir hez dikim. Ji xwe re çêdikim, îja baş be xirab be, ev mewzûyeke din e. (Em dibîşirin) Ez nikarim hefteyekê bê tabloyan bimînîm. Dema diçim Kurdistanê, bi taybetî jî li başûrê Kurdistanê piştî çend rojan çavê min birçî dibe. Ez ferq dikim ku li dîwarê ti mal û

ofîsî tişteki hunerî tune ye.

-Pekî tu herî zêde ji kîjan resamên Kurd hez dikî, dişopîni?

**Hinêr Saleem:** Resamên gelek baş hene. Yek ji wan Kurdekî ji Antakyayê bû û yek ji damezrînerên Enstîtuya Kurdî Parîsê bû. Berê çend salan emrê Xwedê kir. Navê wî Remzî Paşa bû, li Parîsê dijiya. Tabloyên wî pir bedew in. Hindek resamên Kurdên Sûrîyê hene, gelek gelek baş in. Li Hewlêrê Qerenî Cemîl heye, kêfa min gelek ji karê wî re tê. Û gelekên din jî hene.

## “Divê bazara her derhênerekî li welatê wî hebe”

-Dixwazim li ser têkilîya edebiyat û sînemayê pirseke din jî bipirsim. Di sînemaya me da çima em zêde rastî filmên ku ji berhemên edebî hatine lêanîn, nayên? Her derhêner bes senaryoyên xwe dikşîne. Bo çi? Wek nimûne em ê rojekê romanên Bextîyar Elî û Eta Nehayî di sînemayê de bibînin gelo?

**Hinêr Saleem:** Beriya her tiştî divê bo her derhênerekî Kurd, bazara wî li welatê wî hebe. Niha tu rabî romanekê bikî film, heke bazara Kurdî tunebe tu yê ji kû pere peyda bikî û ger kes jî temaşe neke tu yê ji bo çi bikşîni? Zehmet e film biçe sînemaya cîhanê, divê mistewayên wê bilind be, heta cihê xwe di bazara sînemaya cîhanî de peyda bike. Yanî Frensî jî belkî ji sedî 30yê filmên wan li derveyî Fransayê tene firotin. Lê yekî Kurd ger bazar nebe, sînema nebe, sîyaseteke kulturî nebe, ew ê li kû pere peyda bike û çawa nîşan bide? Problem û astengên mezin ev in.



► Ji seta filma dawî ya hinêr saleem



### “Kurtefilm ne sînema ye, lê dikare bibe sînema”

-Tu zêdetirî 30 sal in li Ewropayê dijî. Lê belê tu gelek caran serdana Kurdistan û Tirkîyeyê jî dikî. Gelo navbera te û sînemagerên bakur çawa ye, hûn dibin hevkarên hev? Bi taybetî li bakur derhênerên ciwan bi kurtefilmên xwe derdikevin pêş. Tu wan dişopînî?

**Hinêr Saleem:** Sînema karekî tenyayî ye, ne karê grûban e. Ne hereketeke siyasî ye ku pêwîst be 400 kes li dû te bin. Mirov bi tenê ye. Ez tenê li metbexa xwe, senaryoya xwe dinivîsim û gava pere peyda dikim jî dest bi kişandina filma xwe dikim. Sînema pêwîstî bi komele, kom û qealebalixan nîn e. Tiştên bedew çêdibin bêguman, dixwazim nas bikim. Kurtefilm jî tiştên pir baş in, lê nikarim bêjim ku kurtefilm sînema ye, lê dikare bibe sînema.

### “Serxwebûna siyasî ji bo pêşketina sînemayê gelek girîng e”

-Ev 22 sal in ku tu di nav sînemayê de yî. Bi giştî rewşa sînemaya Kurdî çawa ye li gorî te?

**Hinêr Saleem:** Sînema ne wek roman û şî'r nivîsandinê yan wek tablo çêkirinê ye. Bo nimûne; Yaşar Kemal bo nivîsandina berhemeke edebî pêwîstiya wî bi 5 Lîreyî Tirkî hebû ji bo qelemek û du defteran bistîne. Yanî eger tu şair bî, pêwîstiya te bi qelem û kaxizek heye ku tu şî'reke pir bedew binivîsî yan jî romaneke miezem. Mehmed Uzun yan Firat Cewerî mesela, ku tiştên pir bedew nivîsandine û dinivîsin, bi wan şans heye, lewra bo wan qelem û kaxizek tenê pêwîst in. Ez carinan wan dihesidim jî. Lê tu filmeke pir pûç û xirab jî bikşînî, divê tu perê te hebe û tu bi ekîbekê ra kar bikî. Lewma sînema tişteki gelek taybet e. Tu nikarî bi beşên din ên hunerê re miqayese bikî.

Lê ez bawer dikim di nav Kurdistan da hêdî hêdî genc derdikevin ku mêjiyê wan unîversal e, dinyaya îroyîn fêhmî dikin û bi gerdûnî fikir dikin. Serxwebûna siyasî ji bo

pêşketina sînemayê gelek girîng e. Dewleta Kurdî nebe jî, ew welatê pê ve girêdayî ne, divê wezareta kulturî li gorî nifûsa Kurdistan, ji bo sînemaya Kurdî jî budçe terxan bike. Zehmet e, lê mimkun e sînemaya Kurdî were asta cihanî. Sînema ne tenê huner e, endustrîye jî.

### “Sermayedarekî Kurd an Tirk nikare perê xwe bo sînemaya Kurdî serf bike”

-Te li jor hinekê behsa astengiyên siyasî kir. Li gorî we problemên sereke yên sînemaya Kurdî çi ne?

**Hinêr Saleem:** Problema sereke nebûna azadiya kulturî û aboriyê ye. Sermayedarekî Kurd an Tirk nikare perê xwe bo sînemaya Kurdî serf bike, reklama wê bike û belav bike. Çinkî rîsk heye tê de. Lewra bazara sînemaya Kurdî tune ye. Çimkî siyaseta wisa kiriye ku bazara Kurdî nebe. Komediyeke Tirkî dema derdikeve, belkî 2-3 mîlyon kes wê dibîne. Lewra bazar bo wan vekirî û azad e. Lê tu filmeke bi Kurdî çêbikî zehmet e, lewra astengî pir in. Mixabin divê li welatekî demokratîk û medenî, tiştên wiha nemînin. Ev eqliyeta kevn a berî 200 salan ku bi kêrî îro nayê divê nemîne. Divê astengiyên li pêşiya çand û zimanê Kurdî bîn rakirin.

### “Kurd pir ji xwe razî ne”

-Êdî xort û ciwanên Kurd zêdetir berê xwe didin çada sînema û hunerê. Tevî kêm derfetan jî filmên serkeftî tîn çêkin. Wek derhênerêkî bi tecrube, tu dixwazî ji bo sînemagerên ciwan çi bêjî?

**Hinêr Saleem:** Divê mirov berî her tiştî karekî pir baş bike. Senaryoyekê pir baş binivîse. Divê mirov zû bi zû ji xwe re nebêje senaryoya min miezem e. Gerek meriv xwe pê biwestîne û bizanibe ku îro sewîyeya sînemaya dinyayê li kû ye. Kurd adeten pir ji xwe razî ne. Kurtefilmekê çêdikin dibêjin ez derhêner im. Yekî Frensî 40 kurtefilm çêkiribin jî li meclisan şerm dika bibêje ez derhêner im, dibêje min kurtefilm kişandine û ez dixwazim filmeke sînemayî çêkim û bibim sînemakar. Yek; tewazû, divê

mirovên mutewazî bin. Ya duduyan; divê pir bixebitin. Tenê kar mirov bi pêş de dibe. Û divê baweriyê bi xwe bikin. Bila kultura xwe dewlemend bikin û ji Kurdbûna xwe şerm nekin. Normal bijîn, normal fikir bikin û li dinyayê binêrin.

### “Ez niha li ser senaryo û romanekê dixebitim”

- Niha li ber destê Hinêr Saleem çi proje hene û di metbexa wî de çi dipije? Proseya pandemiye çi tesîr li te kir?

**Hinêr Saleem:** Min payîza çûyî li başûrê Kurdistanê filmek çêkir. Niha navê dawî hêj ne diyar e. Lê ez dibêim bi Kurdî de wiha be: “Maçek Li Ser Lêva Dicle”, lê nizanîm êdî dema film derkeve wê ev nav lê be yan na, em ê bibînin. Fîlmê bi temamî bi zimanê Kurdî ye. Lê meseleya coronayê hemû karê me bi derengî xistin. Heke na, midûrê Festîvala Cannesê dîtibû û qebûl kiribû ku film biçe “kompetîsyona” (pêşbazî) Cannesê. Lê festîval betal bû û karê me jî sekinî.

Naveroka fîlmê jî bi kurtasî wiha ye; Gencekî xwebexş ê Kurd dibe pêşmerge. Ew û keçikek aşiqên hevûdin in. Heft-eyek beriya ku bizewicin birîndar dibe, lê birîneke piçûk e. Şeva zewacê keşif dike ku organê wî yê seksê, ji ber birîna wî nalebite. Her du aşiqên hev in, dixwazin bi hev re bijîn lê êdî peywendiya seksî di navbera wan de ne mimkun e. Wê çawa ev her du însan karibin bi hev re bijîn? Helbet civak wê çi bêje, malbatên herdu aliyan wê çi bêjin? Ev problem jî li civakên wek me û yên li Rojhilata Navîn, tabûyek e ku qet êşkere behsa problemên seksê nayê kirin. Ev problem û trajedîyeke gelekî mezin e. Lê keçik wî qebûl dike û dibêje ez dikarim heta dawiya emre xwe bi te re bijîm û bila qet seks tune be jî.

### “Nikarim milîtanîyekê bê sûd di roman, film û resmê da çêkim”

- Gelek baş e. Me mizgînîya film û romanekê nû jî ji te bihîst niha. Pekî, roman wê bi Frensî be yan bi Kurdî?

**Hinêr Saleem:** Bi xwedê carê nizanîm... Karê min nivîsandin e. Lê ez nikarim di roman, film û resmê de milîtanîyekê bê sûd bikim. Ez ê tiştan çêbikim, îja Kurd yan rojekê wê bêjin, me şans hebû Hinêr Saleemê me hebû yan jî wê lanetê li min bînin. Ev herdu halet jî min qebûl in.

### “Kurd jî ketine nav trêna pêşveçûnê”

- Me pirsra pêşeroja sînemaya Kurdî li te kir, îja dixwazim bi giştî pirsra pêşeroja Kurdan jî ji te bipirsim. Tu bi kurtasî pêşeroja Kurdan çawa dibînî?

**Hinêr Saleem:** Dinyaya îro ji bo zaliman ne dinyaya berê ye. Û ji bo mezlûman dinya hatiye guhertin. Dinyaya îro ne dinyaya duh e. Îro Kurd jî ketine nav trêna pêşveçûnê. Miheqeq wê rojekê bigihîjin kenara / bendera aramîyê. Yanê wê bigihîjin azadîyê.

### “Sosyal medya bo miletekî wekî Kurd pir girîng e”

- Navbera te û medyaya sosyal çawa ye? Em te zêde li ser torên civakî nabînin, bo çi?

**Hinêr Saleem:** Ti hesabekê min ê medyaya sosyal nîne. Min hezêke taybet nîn e ji bo bikaranîna medyaya sosyal. Lê medyaya sosyal bo miletekî wekî Kurd pir girîng e.

### “Mirov dikare her tiştî bikire, lê nikare wext bikire”




- Bo çi tu bikar naynî?

**Hinêr Saleem:** Çimkî mirov dikare her tiştî bikire, lê nikare wext bikire. Ew wextê min heyî ez ji bo xwe, ji bo tiştên girîng derbas dikim. Her wiha ez naxwazim zêde werim pêşîya kamera, spot û flaşan, ku xelk behsa min bike. Li Ewropayê jî tiştêkî pir girîng nebe ez hevpeyvînan çênakim. Ez ji tenyayîyê hez dikim û ez bes karê xwe dikim.

**“Dixwazim çend saniyeyan bi rolên piçûk îmzeya xwe lê bikim”**

- Lê tu di filmên xwe da bi rolên piçûk be jî dilîzî.

**Hinêr Saleem:** Melayê Cizîrî, Ehmedê Xanî û herwiha Nalî jî çawa di şîrên xwe de li cihekê îmzeya xwe lê dane, ez jî belkî li ser rêçika wan diçim. Herwiha kêfa min gelek ji Hitchcock re tê. (Hitchcock di hemû filmên xwe da bi rolên piçûk be jî listîye û bi vî şiklî wek terz û îmzeya xwe di sînemaya cihanî da deng vedaye.- O.B-) Çend saniye hez dikim wekî îmza û bîranînekê di filmên xwe de bilîzim. Û gelek kêfa min ji akteriyê re tê. Lê mixabin ez ne akter im. Lewra jî ez çend saniyeyan di filmên xwe da cih digrim û bes.



► Hin tabloyeên Hinêr Saleem

# DILKETIN



Minewer Aslan

*Dil ketimê dil ketimê, cara pêşî dil ketimê...*

...

Dilketin/evîn/eşq, hezkirin û girêdana hestî ya li hemberî kesekî din e. Pênaseya evînê/eşqê tevlihev e, ji ber ku faktorên cur bi cur di nava xwe de dihewîne. Pênasekirina wê çiqasî zor be jî, diyar e ku li gorî çandê û kesan diguhere û heta hetayê nadome û piştî wextekî (max 2,5 sal) xilas dibe.

## Lê eşq çawa dest pê dike?

Di kurdî de weke gelek zimanên din, destpêka evînê "dilketin" e. Lêbelê êdî baş tê zanîn ku warê eşqê ne dil e, mêjî ye. Belê ev rastiyeke tehl e; ji ber ku stran, helbest, pirtûk, film û heta çikolatên 14ê sibatê jî, sembola eşqê weke 'dil' nîşan didin. Lê divê hinek Eros hişyar bikin ji bo ku tîrên xwe li cihên şaşo maşo nexe. Xuya ye ku heta demeke dirêj jî wê sembola eşqê dil be, ji ber ku mêjî hîç ne romantîk e.

Li gorî lêkolînên zanista norolojiyê, dema em dil dikevin kesekî, hîpotalamûs hin hormonan derdixe holê. Adrenalîn zêde dibe û dilê evîndar bileztir lê dixê; dopamîn hem coş û kelecane dide hem jî dike ku weke obsesyone, ew kes ji evindara/ê xwe pê ve tişteki din de nefikire; oksîtozîn dike ku bi kesê evîndar ve were girêdan, nor-adrenalîn dike ku dil leza xwe zêde bike û dest bilerizin. Ev tev dikin ku wextê hezkiriya/ê xwe dît, dilê evîndar kutekutê bike, çavên wî beq bibin, destê wî bilerizin, di mîda wî de pirpirînk bifirin, ji eşqa û coşa evînê, xwe bextewar hîs bike. Hin teorîsyen dilketinê weke patolojiyekê dibînin, ji ber ku di mêjî de cihên mentiqê disekinîne, tenê yên zewq û keyfê dişuxilîne. Li gorî hin lêkolînan dema em êşa eşqê dikşînin, mêjiyê me vê weke êşeke fîzîkî hîs dike, di

mêjî de heman cih pê dikevin.

Şiklê hezkirinên me jî jev cuda ne. Hin ji me xwe li ser hezkiriyên xwe dikujin, hin jê tenê hez dikin. Li gorî Bowbly, pitik heta yek saliya xwe bi dayik yan jî kesên ku lê dinêrin re dikeve nav têkiliyekê. Heke pitik xwe di vê têkiliyê de ewle hîs bike, wextê mezin bû di têkiliya xwe ya romantîk de jî xwe ewle hîs dike. Heke dayik li pitika xwe xwedî dernekeve û zêde guh nediyê, ew pitik ji diya xwe bawer neke, hej xwe nake û dê xwe bêqîmet hîs bike. Wextê ev be-bek mezin bibe û kete têkiliyeke romantic, dê ji partnerê xwe bawer neke, nexwaze jê dûr bikeve, nexwaze tenê bimîne û dê her di tîrsa veqetînê de be. Ger ew hesta ewlehiyê bi pitikan re çênebe, di mezinbûna xwe de jî wê hestê zû bi zû nabînin û wê di têkiliya xwe de her bi şik û guman bin. Yanî têkiliya me ya heta yek-du saliya me, diyar dike bê em ê di têkiliya xwe ya evînî de çawa tevbigerin.



Gelek caran Kurmanc û Zaza “şer”ê hev dikin û li ser Kurdayetiya aliyê “din” şiroveyan dikin. Hin Kurmanc û Zaza jî hene ku guh nedane van nîqaşan û zaravayên hevdû elimîne. POPKURD’ê ji Kurmancên ku hînî Zazakî bûne û Zazayên ku Kurmancî elimîne pirsî:

## TI KURMANC Î, QEY ZAZAKÎ MUSAYÎ?



**Ayhan Merettowar**

Wexto ke mi Zanîngehê Dicle de beşê zîwan û edebîyatê tirkî wendêne, dimilkî bala mi ante. Xora herêma ma Xerzan de zî çend dewê dimilan estê, hosta û şagirtê bapîr û piyê mi bi xo dimil bîyî. Mi domaniya xo de qalkerdişê dimilan eşnawitbi. Sinifa mi de çend embazê min ê pîraniyê estibî. Ma miyanê xo de tim gramer û ferhengê dimilkî ser o sohbet kerdêne. Badê mi unîversîte qedîname û ez seba mamostatî şîya qezaya Erxenî, ez dimilkî ser o zêdêr xebitîya û mi waşt bi rayîrê goşdarîkerdiş û qalkerdişê dimilkî bimusa; labelê mi dî ke heta ke ez çekûyanê dimilkî sey nuşte nêvîna, ez nêşkena bimûsa. Ê samedî ra mi giraniye daye metnanê nuştekiyan ser. Çend serran ra dima hêdî hêdî berê dimilkî mi rê a bi. Ez eşkena derheqê musayîşê dimilkî de çend sedeman dîyar bikera:

1. Ma sey kurmancanê Vakurî , qalanê xo de vanê ke kurmanc û dimilî bira yê, dimilkî, sey kurmanckî, lorkî, gorkî û sorankî, dîyalektêkê kurdî yo; labelê bala min ante ke her çiqas zafêrê dimilî eşkenê kurmanckî qal bikerê, kurmanckî ra hes kenê, kurmanckî ser o xebitîyenê û pereyê

xo danê kitab, kovar û rojnameyanê kurmanckî, bi zerweşî wanenê û nûsenê zî. La hema way û birayê kurmanckî, hîç rehetîya canê xo ra tawîz nêdanê û panc qurûş pereyê xo nêdanê kitabêkê dimilkî, kovarêke nêgenê û nêwanenê. Mi xo ra şerm kerd. Mi vat lazim o ez bi musayîşê dimilkî, hem samîmîyetê xo yê heskerdişê dimilan îsbat bikerê hem zî wezîfeyê xo yê hemwelatîye biyara ca. Nê samedî ra ez hema zî xebitîyena ke dimilkî bimusa û goreyê taqet û derfetanê xo kitab, kovar, rojname û televîzyonanê dimilkî teqîb kena.

2. Dezgehêkê Ewropa seba dimilkîya ma ya şîrîne, emrêko kilm dîyar kerd. Ma zî zerrî û derûnî ra bawer kenê ke bi raştî zî zîwanê ma şîno, mireno. Mi xo rê vat ke lazim o ez sey hezkerdoxêkê heqîqî yê dimilkî seba cuwiyayîşê dimilkî bixebita.

3. Qederê ma kurmanc û dimilîyan hema hema her hetî ra sey yew bînî yê. Ma hema zî tam nêzanê ku ma çi wextî ra heman cografya de piya sey şarêkê dost, cîran, eqreba û keyeyî ciwîyenê. Gereka ma sey kurmancan wayîrê dimilkî vejîyê.

4. Kilamanê ma yê dengbêjan de tim name û nîşaneyê çêran ê dimilan estê. Rojanê xedaran de kurmancan hawarê xo berdêne dimilîyan het. Ewro dimilkî, binê tehlukayê vînbîyayîşî de yo. Heq o ke ma pêro sey kurmanckîya xo, eleqe bimojnê dimilkî.



**Hebûn Stembar**

Yew eşkeno vajo dîyalektê kurdkî manenê çar estûnanê yew banî; eke yew ci ra kêmi bibo, hemsencîya çi nêvirazîyena, o ban pay ra nêmaneno û merdim bese nêkeno binê ci de biciwîyo. Dîyalektê kurdkî zî wina yê: Gama ke merdim teyna dîyalektê xo bizano û biwano, zanayîşê ey huner, kultur û edebîyatê pêroyî yê ziwanê ey ser o sînorkerde beno. Gama ke mi ferq kerd ke zanayîşê mi nê hetî ra sînorkerde yo, cade mi dest bi musayîşê kirmanckî kerd. Her çiqas ez bander bîya zî, semedo

ke heta nika na zengînîye ra bêpar menda, ez zaf xemgîn zî bîya. Labelê merdim key û kotî ra dest pêbikero, kar o. Nika ez vînena kirmancan ra ber xebera kurdan nê zengînîyan ra çin a. Ez fam nêkena senî beno ke hayîya ciwananê kurdan pê Celadet Bedirxanê hemdemî Malmîsanijî çin a. Senî merdim ked û zehmetkêşîya Grûba Vateyî ra hayîdar nêbeno? Senî merdim tamê edebîyatê Îhsan Espar, Deniz Gunduz, Nadîre Guntaş Aldatmaz û êyê bînan ra mehrûm beno? Senî xebera merdimî muzîkê Husên Doxanay, Kerem Sevînc, Mikail Aslan, Mehmet Akbaş, Sasa Serap û êyê bînan ra nêbena? Welhasil ma bê kirmanckî her hetî ra nêmcet ê. Ganî ma kirmanckî bizanê, biwanê, goşdarî bikere. Meşte ney, hema ewro!



**Mem Artêmet**

Kirdkî seba mi firsendê rijnayîşî yê yewbînî ra dûrbîyayîşê lehçeyanê kurdkî bî. Hefteyanê xo yê ewilan ra heta roja xo ya peyêne mi Çewlîg de kirkî qisey kerd, ez hewt serrî Çewlîg de menda, eke ez kirdkî nêmusayêne no mi rê bîyêne şermêko pîl.

Ez pê şa û sereberz a ke ez eşkena sewtê Rênçber Ezîzî hîs bikerî û deyîranê ey fehm bikerî, şîrêka Malmîsanijî û hîkayeyêka J.Îhsan Esparî biwanî, vateyê xo biresnî pîrêka dimilî û yan zî firine ra nanêk bi dimilkî biwazî. Tena lehçeyê kurdkî ney, bedilîyayîş û cîyatîye şarê ma mîyanî de tersêko giran peyda kerdo. Heqîqeten lazim o ke ma yewbînan bonder bikerî yan ney ma do miletbîyayîşî ra mehrum bimanî.


# TU ZAZA YÎ, ÇIMA HÎNÎ KURMANCÎ BÛ?




**Roşan Lezgîn**

Em ji xwe re dibêjin “Kird”, ji diyalekta xwe re jî dibêjin “Kirdî”. Jixwe navê kitêba me ya pêşîn bi xwe jî “Mewlûdê Kirdî” ye. Lê Kurmancên me ji me re dibêjin “dimbilî”. Paşê em pê hesîyan ku Tirk ji me re dibêjin “Zaza Kürtler” û ji diyalekta me re jî dibêjin “Zazaca”. Her çiqas Kirdî û Kurmancî du diyalektên gelek nêzik ên Kurdî bin jî, min bi xwe heta 25 salîya xwe gelek kêma Kurmancî dizanî. Îcar di sala 1988an de, tam dema jenosîda Helebçeyê, di suhbetekê de melayekî helbesteka seydayê Cîgerxwînî xwend. Helbest muhteşem bû, seydayî jî gelek xweş dixwend. Beytek jê hîn jî di bîra min de ye: “Hengur li baxê xweşîn û meşîn / Bilbil li şaxê îhram dikişîn.” Wê rojê eşqa Kurmancî li min ket. Paşê, di sala 1990î de HEP hat danîn, di sala 1991 de bi SHP’ê re îtifaq kir û gelek şexsîyetên Kurd bûn parlamenter. Di mîtîngên kampanyaya hîlbijartinê de hinek namzedan bi Kurmancî xîtabê xelkê dikir. Em bibêjin Leyla

Zana û Sedat Yurtdaş, dîsa Mehdî Zana jî bi Kurmancî xeber da. Dema min guhdarî dikir, ji ber hîsîyata neteweyî çavên min tijî dibûn, çokên min sist dibûn, ez di cihê xwe de dihatim xwarê. Wê demê ji min re wisa dihat ku, eger Kurdistan bête danîn, dê zimanê resmî Kurmancî be. Çimkî Kurmancî bi rastî jî zimanê domînant ê kurdan e, her ji qedîmî ve zimanê tadrîsatê bûye. A ji wê demê vir de, min xwe da ser Kurmancî, min got divê ez hem bikaribim Kurmancîya her deverê fêma bikim, hem Kurmancîyeke bêaqsan xeber bidim hem jî bikarim bixwînim û pê binivîsim. Kurtê meseleyê, hînbûna min a Kurmancî ji ber hîsîyata neteweyî çêbû. Jixwe paşê min gelek faydeya Kurmancî dît. Eger meriv diyalekta Kurdî gelek baş bizane hingê dikare gelek zû fêrî diyalektên din jî bibe. Niha dema ez Kirdî dinivîsim, ji layê peyvan û terman ve, ji layê qalibên îdyomkî ve ez ji Kurmancî îstîfade dikim. Îcar dema ez Kurmancî dinivîsim yan diaxivim, qaydeyên gramatikî yên Kirdî, mesela qaydeyên sentaksê ji min re rêbertiyê dikan. Çimkî qaydeyên eslî yên sîstema Kurdî di Kirdî de gelek paqij mane, lê ji aliyê peyvan û terman ve Kurmancî pêşketî ye.





**Welat Ramînazad**

Di Gulana sala 2013an de, xwe bi xwe bi wergerandina bi ferhengê min dest bi fêrbûna kurmancî kiribû. Ku xelet neyê bîra min di Cotmehê de min hem dest bi xwendinê hem jî dest bi qisekirina kurmancî kiribû. Ez çima kurmancî fêr bûm? Ji ber netewperweriya xwe; ji bo ku ez bi kurmancan re bi zimanê dagirkeran qise nekim ez kurmancî fêr bûm. Têne sedema min ev e. Lêbelê ji hêlekê ve bi kurmancan re kurmancî qisekirin jî min gelek aciz, ji bo ku ez zimanê dagirkeran neaxivim, ez bi mecburî bi wan re kurmancî qise dikim lê ez vê qet naxwazim. Çimkî

li vir jî asmîlasyoneke navxweyî heye!.. Ez dixwazim bi kurmancî re bi zazakî, ew jî bi min re bi kurmancî bipeyive. Yan jî ez wekî zaza bi wê/wî re kurmancî ew jî wekî kurmanc bi min re zazakî qise bike. Kurmancêk bi zazakî, zaza jî bi kurmancî binivîse. Herwiha ez naxwazim kurmancî Behdînî bi soranekî Silêmanî re soranî biştexile, bi heman awayî yê Behdînî bi kirmancî, yê Silêman jî bi soranî qise bike. Divê vî tiştî em di nava xwe de pêk bînin û xwemalîtiya xwe û netewbûna xwe bikin. Vê diyardeyê wê me bihêz bike û pêş ve bibe, bi vî awayî em dikarin pirsgirêkên xwe yên pîr zimanî-lehçeyî çareser bikin û netewbûna xwe ava bikin, heke na; ev pirsgirêkên me wê her kûrtir û tevlihevtir bibin.



**Mutlu Can**

Ez çima hînî kurmancî bûm? Di eslê xwe de bersiva vê pirsê bi xwe jî pirsek e; “Ma ez ê çima hîn nebûma?”

Kurmanc jî wek kirmancan/zazayan parçeyekî neteweya kurd in. Jê wêdetir, kurmanc cîranên civaka me kirmancan in, dostên bav û kalên me ne.

Di hiş û hafizeya min a şexsî û civakî de jî rêçên kurmancan û lehçeya wan kûr in.

Û hebûna van rêçan tiştêkî tebiî ye. Ji bilî vê jî, kirmancî çiqas kurdî be, kurmancî jî ewqas kurdî ye. Em van yekan hemûyan bidin aliyekî, heke kurmanc bes cîranên me jî bûna, ma qey ne heq bû ku em feraseta wan meraq bikin û hînî zimanê wan bibin.

Xulasa li gorî min çay û şeker bi hev re çî bin, kurmancî û kirmancî jî ew in.



# FÛTBOLÎSTÊN KURD

Li cîhanê bi hezaran tîmên fûtbolê hene. Wekî ji gelek nijadan, di nav van tîman de fûtbolîstên Kurd jî hene. Werin em bi hevdû re çend ji wan fûtbolîstên jîr û jêhatî nas bikin.



**HARÛN EREN**



**ALIREZA SAFAR BEIRANVAND**

Di 21ê Îlona 1992an de, li Xurremabadê ji dayik bû. Alireza ji bo xeyalên xwe yê futbolvaniyê ji malê revî, çû Tehranê û li wir demek bêmal jiya. Di navbera salên 2008-10an de, di tîma bingehîn a Naft Tahrane de lîst. Di sala 2011an de derket maça xwe ya ewil a profesyonel û heta sala 2016an jî li vir lîst. Bi formaya Naft Tahrane cara ewil di Lîga Şamîyonan a Asyayê de lîst. Di Naft Tahrane de bi giştî 68 maç lîstin. Kalevanê zîrek, di 16ê Gulane 2016an de transferi yek ji tîmên mezin ên Îranê Persepolisê bû. Di sala 2017an de, 718 deqeyan qet gol nexwarin û di Lîga Pro ya Kendava Besrayê de rekor şikand. Bi formaya Persepolisê 88 maç lîstin. Di 2019an de Destgor-ka Zêrê bi dest xist, bi tevahî jî 4 caran bi dest xistin. Bi Persepolisê re di Lîga Şampîyonan a Asyayê de heta fînalê derket. Di Kûpaya Cîhanê ya 2018an de bi performansa xwe ya bi tîma neteweyî ya Îranê, bala cîhanê kişand. Degajên pir dirêj û refleksên pir bilez, taybetiyên wî yê herî girîng in. Wek baştirîn Asyayî yê dîroka Kûpaya Cîhanê hat bijartin. Heta sala 2020an bi formaya Persepolisê di Lîga Kendava Besrayê de 4 caran bû şampîyon. Di havîna 2020an de transferi tîma Royal Antwerpê ya Belçîkayê bû.



**KAVEH REZAEI**

Di 5ê Nîsana 1992an de, li Kirmanşahê ji dayik bû. Heta sala 2017an di tîmên Îranê de lîst. Bi formaya Fooladê 33 maç lîstin. Bi tîma Saipayê di 69 maçan de 12 gol avêtin. Bi formaya Zob Ahanê di 34 maçan de 11 gol avêtin û di Kûpaya Hazfî ya Îranê de 2 caran bû şampiyon. Bi formaya Esteghlalê di 28 maçan de 7 gol avêtin. Di sala 2017an tranferî tîma Charleroi ya Belçîkayê bû, sezonek li vir lîst û di 33 maçan de 15 gol avêtin. Di sala 2018an de çû taxima Club Bruggeyê û piştî 11 maçan wek demkî dîsa ji Charleroiyê re transfer bû. Di 22 maçan de 12 gol avêtin û niha jî li vir dilîze. Futbolvanê jêhatî, bi formaya tîma neteweyî ya Îranê di 12 maçan de golek avêt.





**MAHMOUD DAHOUD**

Di 1ê Çileyê 1996an de li Amûdê ji dayik bû. Di sala 1996an de bi malbata xwe re çû Elmanyayê. Di bingehiya tîmên Fortuna Düsseldorf û Borussia Mönchengladbachê de lîst. Di sala 2010an de, di 14 saliya xwe de bi formaya Mönchengladbachê maça xwe yê ewil a profesyonelê lîst. Ji 2014an heta 2017an, bi formaya Mönchengladbachê di 61 maçan de 7 gol avêtin û 14 asîst kirin. Di sala 2015an de li hemberî Sevillayê maça xwe yê ewil a Lîga Şampiyonan lîst. Di 1ê Tîrmehê 2017an de transferî Borussia Dortmundê bû. Futbolîstê jîr, niha jî ji bo Dortmundê dilîze. Mahmoud Dahoudê 24 salî, bala gelek tîmên mezin dikişîne. Di sezona 2019-20an de 14 maç lîstin, ji van 2 heb, maçên Lîga Şampiyonan bûn. Di sala 2017an de, bi formaya tîma neteweyî ya Elmanyayê, di Şampiyonaya U21ê de bû şampiyon.



## ME JI 10 KESAN PIRSÎ

Bi ya te, ji hêla weşan û xebatan ve, weşanxaneya herî serkeftî ya Kurdî(Kurmancî) kîjan e? Çima?



**LEYLA ÖZKAPLAN**

Ez wek xwînerake Kurdî, xwînerake wêjeya Kurdî dikarim bêjim dema qala weşanxaneyên Kurd an jî weşangeriya Kurdî tê kirin, pêşî Avesta û Lîsê tê bîra min (ji ber ku ez herî zêde pirtûkên van herdu weşanxaneyên Kurd dixwînim). Bi ya min, ji hêla weşanan ve Avesta weşanxaneyêke serkeftî ye lê ji hêla xebatan ve kêmasî hene. Dibe ku sedem aborî be lê dîsa bi

ya min, weşanxaneyêke mîna Avestayê ku va ye sere 25 salan in weşangeriyê dike, divê heya niha, çendîn zehmet be jî, karibîya bi alternatîvên cûr bi cûr pirsgirêkên xwe yê aborî çareser bikira. Weşan an xebat muhîm e? Helbet herdu jî û li gorî min Lîsê, him jî hêla weşanan him jî ji hêla xebatan ve serkeftî ye. Weşanxaneya Lîsê, bi xebatên xwe dikare ji bo wêjeyê û bi taybetî jî ji bo wêjeya Kurdî qadan veke; wek mînak Wêjegeh Amed. Û dîsa, wek xwînerake Kurdî, bi ya min, pirtûkên weşanxaneya Lîsê jî gelek serkeftî ne, bi taybetî jî pirtûkên wergerê!



**Bilal Xerzî**

Pirseke wiha mirov di binê simbêlan de bêhemdî dikenîne. Em ê jî bibersivînin û neheqî li yê mayî bikin. Di navbera Peywend -Peywenda heta niha- û Wardozê

de mam. Weşanxaneyên din tevî karên wan ên baş, berhemên ne baş jî çap kirine. Lê ji hêla xebatan ve Wardoz xezîneyekê dicivîne. Roman û çîrokên Peywendê jî (ji hêla têşe, ziman, mekan, leheng, tevn û hwd.) çî nîn bin baş in -çî nîn bin ha-. Berhemên teorîk ên Peywendê ji xwe serî dikêsin. Yanî belkî berhemên wan hindik bin lê tev jî rindik in.



**MAHABAD ANTER**

Ji bo min bersiva vê pirsê Avesta ye. Ji ber ku qada wan a wergerê berfireh e û ji gelek zimanên cihanê ji bo Kurdî berhem hatine tercumekirin.



## GULÊ PORSEVAN

Bi çend bîranînên xwe yê li ser xwendina pirtûka xwe ya yekem dixwazim biber-sivînim pîrsa we. Bi rastî min dereng dest bi xwendina kurdî kir û pirtûka yekemîn tenê ji ber ku bi zimanê Kurdî bû min xwend. Wê çaxê bala min qet tiştekî dî nekişandibû lê zimanê pirtûkê wiha zehmet bû ku tesireke nebaş li ser min kir. Ji wir û vê de min gelek pirtûk bi ser wê pirtûkê xistin û min ev fêhm kir ku di navbera wan pirtûkan de gelek ferqan xwe nîşan dida. Bi qasî nivîskar, şikl û navê pirtûkê, weşanxane jî girîng e. Ji xeynî wê; pîvana pirtûk, cîld, kaxez, qapax û navero-kê, gelek ferqiyê dixwe meselê. Divê zimanê pirtûkê temamî rewan be û di wergera pirtûkê de taybetmendî û wateya ziman

wenda nebe. Ez dibêm weşanxane tenê ne cihê ku pirtûkan çap bike, cihe hilberandina nêrîn û ramanan e, ji bilî vê, cihê temsîlkirina hemû nivîskaran e.

Her wiha li ber çavên min êdî bi vî rengî Avestayê cî girtiye, çimkî daneheveke bitecrûbe û asteke bilind li wir xwe diyar kiriye. Li ber dilê min Avesta bi hêze-ke mezin û bi tevgereke xurt berheman pêşkeşî me dike. Em hemû dizanin ku berevaniya xebata çanda doh, îro û siberojê dike, ji xeynî wan jî Avestayê di arşîva xwe de bi hezaran berhemên cûr bi cûr, bi erka wêjeye bi cih kirine. Avesta di weşangeriyê de derfet daye wêjaya Cihane jî û gelek berhemên nivîskar û helbestkaran xweş hewandiye. Li gorî min di çarçoveya wêjeya kurdî de, Avestayê xizmeteke analîtîk, rexneyî û hêja daye, dide û hêvîdar im dê bide jî. Û her wiha ez dibêm Avesta pesndayîne gelek heq dike.



## DİLEK DURGUN

Hemû weşanxaneyên me ji bo zimanê kurdî xebatên gelek binirx, bi qedr û qîmet dîkin lê belê li gorî min weşanxaneyên herî serkeftî, Nûbihar e.

Min çavê xwe yê ziman bi weşanxaneya Nûbiharê vekir. Cara yekem ji bo hîn zimanê xwe bibim çûm komeleya Nûbi-

harê, xwendin û nivisandina min a Kurdî bi saya wan bi pêş ve çû. Nûbihar navê ku ji dilê min derbas dibe ye lê heke em mijarê li ser realîteyê binirxînin dîsa “Nûbihar” a herî serkeftî ye. Dema ez dixwazim mijareke dîrokî bixwînim, an lêkolînekê bikim yan jî ji mijareke akademîk baş fêhm bikim, ewilî destê min diçe materyalên Nûbiharê. Ji ber ku li ser mijarên lêkolîn, dîrok û akademîk xebatên muhîm lê çap dibin. Taybetiyeke din a weşanxaneya Nûbiharê jî ev e; ji aliyê berhemên klasîk û çîrokên folklorîk ve gelek baş û serkeftî ne.



## HÜRRİYET PARLAK

Ez bim, Weşanxaneya Avesta ye, ji ber ku ji sala 1995an vir ve ye qet nesekiniye, kar û xebatên xwe bi tehrekî cidî kirine, hê jî dike. Ji vî alî ve ez dikarim di sêrî da

behsa Avestayê bikim, helbet eva jî li Bakurê Kurdistanê di vî warî de zeyîfiya me Kurdan nîşan dide. Xwezila ji xêra Xwedê re min jî bigota wekî dinê pêncî weşanxaneyên me Kurdan hene ku karibin bi qasî Avestayê di karê xwe de cidî û serkeftî bin, me temsîl bikin. Lê, heyf, na! Kitêbên Avestayê ji me gişkan ra çavkaniyên zehf rind in, em ciwanên Kurd bi wan mezin û serbilind dibin, di her warî de.



**LEYLA DENLÎ**

Ji bo min weşanxaneya herî serkeftî Weşanxaneya Wardozê ye. Ji ber ku xemxurên ziman û çand û folklorê Kurdî ne, di kîjan warî de dibe bila bibe, ew pirtûkên xwe bi tenê bi Kurdî çap dikin û xebatkarên wê bi xwe berhevkarîya folklorê Kurdî dikin. Folklor; bîr, palpişt û koka

gelî ye. Folklor mîna kanîyekê ye, avê dide şaxên jiyana gelî. Eger keresteyên zargotina kurdan bîn deşîfrekirin û nivîsîn, bi hezaran pirtûk ji wan derdikevin, bi sed hezaran rûpel tîn dagirtin. Kurd, eger zargotina xwe bixwînin, nas bikin, dê di her warî de berhemên baştir biafirînin. Ji ber wê, ji bo min weşanxaneya herî pîroz û serkeftî Weşanxaneya Wardozê ye. Weke xemxur û berhevkarê folklorê Kurdî yê gewre Celîlê Celîl dibêje, “Dem dijminê folklorê ye.” Xebata Wardozê, ji ber vê gelekî pîroz û serkeftî ye.



**BAWER YAREN**

Wexta behsa weşan û weşanxanayan dibe bilasebeb Avesta tê bîra min. Ji hêla wê-jeya modern ve xebatên gelek xweş dikin. Herwiha Avesta fersendê dide nivîskarên ciwan.



**ÎNCÎL SELÇUK**

Ji hemû wesanxaneyên Kurdî hez dikim, cihê wan li ser seran e. Lê bi ya min di halê hazir de li bakur weşanxaneya herî serkeftî û ya karê xwe bi awayekî maqûl dike Nûbihar e. Gava pirtûkên Nûbiharê digrim destê xwe, kalîte û edîtorîya wan bi

min dide hîskirin ku di wan rûpelan de, ilm û irfan heye. Mezinên me jî gotine; “nan bidine nanpêjan, bila nîvek jî heqê wan be.” Weşangerî jî wekî nanpêjiyê ye. Dawiya dawî diçe dikeve gewriya mirovan. Lew divê pir paqij û bi hesasiyet bête kirin. Dexl ciqas baş jî bête hêran, dawiyê li ser destê nanpêjeke baş dibe nan. Nûbihar jî nanpêjiya xwe baş dike. Mirov dikare bi dilrehetî nanê wê deyne ser sofreyê hişê xwe.



**MEHMÛD BEYTO**

Li gorî min pirsgerêka herî mezin a weşanxaneyên kurdan nedewambûna wan û nemarkabûna wan e. Ji ber vê, yê ku ev pirsgerêk derbas kiribe, ew ji bo min weşanxaneya herî serkeftî ya kurdan e. Di vê qadê de du weşanxane dertên ber çavê me ku ew jî Nûbihar û Avesta ne. Yek 28 sal ya din jî 24 sal emir kiriye û ev

ji bo weşanxaneyên kurd qewleke pir baş û serkeftî ye, lê divê bête gotin ku; herdu weşanxaneyan jî xwe nekirine markayek (dibe ev ji pirsgerêkên siyasî, civakî û aborî bin) û ev kêmasiyeke mezin e. Nûbihar hê nû malpera xwe ya onlîne vekir û ew jî pirsgerêk tê de hene. Ji xwe ya Avestayê tune ye. Em miletekî bindest in û divê her bi pêş de biçin, ev jî bi saya weşanxaneyê me dê bibe. Ew mezin bibin, em ê jî mezin bibin. Dawiya dawî, ez karim bêjim ya herî serkeftî Nûbihar e lê ya ku dê bibe marka Avesta ye. Serkeftinên bêdawî ji wan re dixwazim.



# DAWIYA DAWÎ DEREWÊN SERDESTAN (SPIYAN) DERDIKEVIN



Berrî Shemdîn

Ez ê dîrekt bikevim nav mijarê; me got kalam madem ji PopKurdê re em ê dini-vîsin, bila mijar li ser hunera populer be;) Ez ê di Dîroka Hunerê da behsa derewên Populer ên serdest("spî")yan bikim. Tenê tiştên baş populer nabin, bi saya serê xiraban, serdestan derew jî populer dibin û rast tên qebûlkin. Em ê bi nîqaşeke nû, li ser beşa Peyker/Heykelan, berê xwe bidin derewên hezar salan û vê mijarê li ser bind-estiya xwe û hunera Kurdî binirxînin.

Serdestan/Spiyan dereweke çawa gotine? Çawa xwe ji rengên din veqetandine? Çawa xwe "mikemmel" ditîne? (Heyrana Frantz Fanon ku ew li ser serdestan -çima Serdest hewce ye xwe "mikemmel", herî baş nîşan bide- gelek tişt gotinê di pirtûka

xwe ya "Çermê Spî - Maskeya Rêş" de lê ez ê li ser vê neaxivim niha) Û çawa bindest/reş+ik biçûk xistine û bindest/reşik/Kurd jî xwe ji wan biçûktir dîtîne û wilo qebûl kirinê?

Em bîn ser mijara xwe; peykerên ji Yewnana Antîk heta îro, bi mermerên spî ji me re hatine nîşandan, spîbûn ji me re, wek ya herî "estetîk", ya herî xweşik dane qebûlkin... Ev hemû hîleyên serdestan/spiyan bûne.

"Van demên dawî nîqaşên ne zelal di nava akademyê de hene, pêdivî bi helwesta ehlaqî û polîtîk heye." Min got "ehleqî û polîtîk" niha nebêjin Berrî jannim, bi jargona rêxistinê diaxife, di nava makaleya



orjînalê da ev gotin, eynî wiha derbas dibe, bnr: <https://www.newyorker.com/magazine/2018/10/29/the-myth-of-whiteness-in-classical-sculpture>

A soxîn du sal berê bi saya jinekê ev meseleya “spîbûnê” hat teşhîrkirin. Jineke ciwan, ji Zaningeha Lowayê, prosefora beşa Klasîkan Sarah Bond(38), yek di kovareke hunerî ya bi navê Hyperallergic, ya din di kovara Forbesê de, du makale weşandin û di makaleyên xwe da got: “Êdî hewce ye em qebûl bikin ku Peykerên Antîk ji spiyeke pak çênebû û mirovên wê demê jî...” Û wiha pê de çûbû; “Împaratoriya Romayê ji Bakurê Efrîqayê hetta welatê Skotiyan berfireh bû, di nav hidûdên xwe de gellek mirov, reng, netew dihewandin. Romayê ji bilî rengê însanan, ji çandî û koka wan a nijadî jî ferq dixist navbera wan.” Sarahê analîz kiriye ku peyker tev, ji rengan hatine paqijkirin.

Heta ku Sarahê ev makaleya xwe neweşandibû, profesorên Hunera Dîrokê, spîbûn, mîna zagona estetîkê qebûl dikirin. Piştî vê nîqaşê jî piraniyê profesorên faşîst gotin, bi şaşîtî dema ji erdê derxistine, ji bo bikeve mûzîyumê zêde paqij kirine, loma ewqas spî bûne. Dîsa profên faşîst dibêjin ev şaşîtî estetîk derxistiye meydanê û baş bûyê...

Gelo bi we jî ecêb nayê, ewqas sal in û di nava vê sedsala teknolojîyê de jî hîn ev şaşîtî berdewam kiribe? Ev “xweşikiya” li ser spîbûnê, Western/Rojavayê cîhanê qanî dike. Di nav me Kurdan de jî wisa bû/wisa ye. Mîsal me keçikeke reşik bidîta, me digot ne xweşik e, reşik e, spîbûn(Gewrbûn) di nava Kurdan de jî ji bo tarîfa xweşikbûnê dihat gotin û hê jî wiha ye mixabin.

Welhasil vê spîbûnê ewqas mezin dikin ku rengên din, ne tenê reş, tiştên rengoreng jî ji rêzê, sivik tînin dîtin. Nivîskarê Elman Goethe ku wêjenasên dinyayê hemû heyranê wî ne, gotiye ; “Netewên hov, zarok û mirovên bêperwerde bi taybetî rengên zindî hez dikin.” Di ser de jî wiha gotiye: “Mirovên kubar wan rengên zindî, li

ser cil û bergên xwe û eşyayên xwe jî bi kar naynin..” (Ev di makaleyê jorîn de heye.)

Li gorî min, ev mesele, bingeha xwe ji dema şerê Dionysus û Apollon ê mîtolojîya Yewnana Antîk digre. Di serdestiya xwe de Apollon (aqil, tragedya , şer, bajar..), Dionysus û temsîliyetên wî (hêst, kêyf, komedî, gund, xweza rengên zindî..) karên “gundiyan” û feqîran dîtine. Li gorî vê; yên bi esl û fesl, ferqa wan ji feqîran heye...

Hûn ê vêga bêjin çi ji me re rengê spî û hişmendîya Western û serdestên Ewropayê, ne? Na jannim, wiha nîn e. Zalimek baskê pirpirokekê bişkîne, hemû pirpirokên reben diêşin.

A soxîn em bînin li ser rengên zindî û Kurdan. Çend sal berê dema ez li Amedê bûm, pêşaneya Bakur çêbû li Galeriayê. Hetta wê demê min tenê wênesazên Kurd ên bakur(dema min dibistana amadeyî qedand, qursa perwerdeya wêneyê girt, ji wê demê ve ye ji wêneyan hez dikim) û hinekên cîhanê nas dikirin. Welhasil min digot qey rengên pastel û rengên sar nebin, wêneyek sivik dimîne lê dema pêşaneya Bakur min ew dîtin û hew mabû ez dîn bim ji wan rengên zindî û xweşik. Ji çar parçeyên Kurdistanê û ji Diasporayê wênesaz, bi rengên cuda hatibûn. Pembeyên ku me digot “mîna yên qereçiyân”, şînen mîna moriya nezerê, mîna rengê şibak û deriyên nava Sûrê, sorên ku yek Kurdek nikarê bêje “Na ez hez nakim ji vî rengî”, zerên çil zer, rengên mîna pazenên qumaş, mîna çarikên kaçax ku di zaroktiya min de ji Wanê dihatin... Yanî ew rengên zindî, rengên jiyana me û derdora me bûn. Paşê min li vir(Ewropa) Efrîqî dîtin.. Ew jî mîna me ji rengên zindî yên gulgulî hez dikin. Misirî jî...

Bi kurtasî van serdestan xwe xira kirine, dixwazin her kes wekî xwe bikin. Çawa me bi dibistanên xwe, girtîgehên xwe, nexweşxaneyên xwe dixwazin terbiye dikin, dixwazin bi derewên xwe me bidin bawerkirin. Heman tiştî bi hunerê dikin lê huner heqîqetê diparêze û dawîya dawî derewê eşkere dike.

# DERENGXISTINA EXTIYARIYA ÇERM



Dr. Rodî Zanyar

Gelek sedem hene ku çermê mirov zû extîyar dikin. Hinek sedem hene ku mirov qet nikare biguherîne lê hinek sedem hene ku guhertina wan di destê me de ne, heke mirov miqate be dikare van sedeman ji holê rake û extîyarbûna çerm dereng bixe.

Extîyarbûna çerm, bi du şeklî pêk tê. Yek; extîyarbûna xwezayî ango hundirîn e, ya din jî extîyarbûna ji pêkerên hawîrdore. Mirov nikare extîyarbûna xwezayî asteng bike lê mirov dikare şiklê jiyana xwe biguherîne û pêkerên hawîrdore yên xeternak asteng bike, rê li ber extîyarbûna pêşwext bibire. Em ê li ser vê mijarê bisekin.

Ligel zêdebûna temenê mirov, cîldê(çermê) mirov jî bi awayekî xwezayî teniktir dibe, zûha dibe, qermiçok û leke berbiçavtir dibin û di encamê de ciwanîya rûyê mirov kêmtir dibe.

*Pirs ev e:*

*Em ê çawa rê li ber extîyarbûna çerm bigirin?*

*Bersiv ne tenê yek e, gelek in*

*Em xal bi xal pê de herin:*

## **Xwe ji tavê biparêzin**

Sedema sereke ya extîyarbûna cîld, tîrêjên tavê ne. Em dikarin bêjin extîyarbûna çerm ji %70-80î ji tavê ye. Ji ber vê yeke, xwe ji tavê parastin, esasa derengxistina extîyarbûna çerm e.

Divê em xwe bi fizîkî ji tavê biparêzin. Şewqe dibe, berçavkên tavê dibin an



cilûbergên ku me ji tavê diparêzin dibin, çi ji destê me hat divê em di wextê wê de û di cî de bi kar bînin.

Carinan bi fizîkî xwejtaveparastin têrê nake, lazim e em melhemên tavê jî bi kar bînin. Pêwîst e dema em derketin ber tava bitîn, em melhemên tavê li rû û stûyê xwe bidin. Melhemên ku em bi kar tînin bila çermê me baş biparêzin, SPF(radeya parastine)'ya wan ji 30 zêdetir be û bila bi xwêdane û avê jî lawaz nebin.

## **Dev ji cixarê berdin**

Cixarekêşî çawa ku zirarê dide hemû tevî(tissiu) û labetên mirov, di heman demê de zirarê dide cîldê mirov jî. Cixare rehên (demarên) ku xwînê tînin çermê mirov teng dike û dixitimînê, ji ber vê yekê çerm ji vîtamîn mîneral û amînoasîdan bêpar dimîne, nikarê xwe zû bi zû nû bike û di dawiyê de qermiçok û leke çêdibin.





### Zêde alkolê venexwin

Her çend ne bi qasî cixarê bizirar be jî, alkol jî zirarê dide çermê mirov û wî dehidrate(bêav) dihêle. Di çermê kesên zêde alkolê vedixwin de tahrîş û sorbûn zêde dibe, rehên xwînê berbiçav dibin, varîs çêdibin û pozên wan mezin dibin



### Sporê bikin

Sporeke zêde ya ne giran, him xwîna ku diçe cîldê mirov zêde dike him ji bergirîye çermê mirov xurt dike, nahêle di çerm de înfeksiyon çêbin. Hewce ye mirov herî kêmtir di heftê de 250 deqeyan werzîşên ne giran bike.



### Xwarinên dirist bixwin

Li gorî lêkolînan; kesên xwarinên bişekir(bikarbohîdrat) zêdetir dixwin çermê wan zû extîyar dibe. Heke di xwînê de şekir zêde be, ev şekir kolajenê ve dizeliqe û dirûva (şikla) kolajenê cîld xira dike û di dawiyê de ciwaniya cîld kêmtir dibe. Li gel vê, kesên fêkî û sebzeyên teze dixwin, qalîteya çermê wan zêde dibe. Divê mirov xwarinên bişekir û çêkirî, zêde nexer mitbaxa xwe û giraniyê bide xwarinên teze û bilif.



### Avê û çaya kesk zêdetir vexwin

Zêde av vexwarin, him cîldê mirov ner-miktir dike him jî çerm ji toksînan(madeyên nebaş) paqij dike. Di çaya kesk de gelek antîoksidan hene ku çermê mirov diparêzin. Divê em rojanê nêzîkî 2-3 lître av û 1-2 îskan çaya kesk vexwin.



### Cîldê xwe bi awayekî kubar bişon

Divê em rojê herî kêr 2 caran çermê rûyê xwe bişon, taybetî jî piştî xwêdanê û berî raketine teqez divê em bişon. Ne hewce ye hûn zêdetir bişon, zêde şuştin û zêde sabûnkirin cîldê mirov zuha dike. Dema şuştinê divê em kubar bin, çermê xwe tahrîş nekin û neherifînin.



### Rojane melhemên nermkirine bi kar bînin

Divê em bizanibin ku cîldê melhemkirî an jî nermkirî qisûran dinixumîne, çermê zuha jî qisûran dide der. Divê mirov hîn bibe, xwe hîn bike û ji bo çermê xwe, rojane melhemên nermkirine an jî melhemên spehîbûne li rûyê xwe bide. Heta 30 salîyê melhemên tenê nermkirine têra hewce-dariyên cîld dikin lê piştî 30 salîyê lazim e melhemên ku di naveroka wan de mad-eyên dijextiyarbûne-antîageîng hene, bîn bikaranîn. Dema tetbîqkirina melheman a herî baş, şev berî raketine ye.



### Kê çi got rûyê xwe nedin

Rûyê mirov eynika tenduristiya mirov e. Divê em xwe biparêzin, guh nedin tiştên eletewş. Li derdora mirov gelek kes hene pêşniyaran dikin, dibêjin nizam filan tişt û bivan melhem baş e, nizam çi çi dike..hwd. Her çildekî, taybetmendiyên xwe hene û divê mirov li gorî çermê xwe, ji pîsporekî an ji dermansazekî pêşniyaran werbigre.



### Çi çax dibe bila bibe ne dereng e, dev jê bernedin







Hin kes hene dibêjin edî ji me bihorî em çi bikin jî bi kêr naye. Na! Ne wisa ye, çiqas dereng be jî, xwe ji tavê parastin, devjêberdana cixarê, kêmkirina alkolê, destpêkirina werzişê û lînêrîna çerm a rojane, gelekî xisarên pêkhatî ji holê radike.

Di qada tenduristî û ciwankariyê de, xweparastin pir girîng e û erzan e jî. Piştî xisar pêk hat jî hinek rê û rêbazên ciwanbûne hene lê ne zêde xwezayî ne û yek ji giranbiha ne. Divê em qîmeta çermê xwe baş bizanibin.

# Koma Kovarêrên Kurd

Koma Kovarêrên Kurd bi hêviya kovarêrên kurd bînê ba hev, bingeheke sazîtiyê bide kovargeriya kurdî, kovargeriya kurdî hem bi sewirandinê hem bi naverokê bi pêş de bibe û pirsgirêkên kovarêrên kurdî bi hev re çareser bike hatiye damezirandin.

## Kovarên Endam



[@KovargerênKurd](#)

[KovargerênKurd@gmail.com](mailto:KovargerênKurd@gmail.com)

# POPKURD

Endama Koma Kovarêrên Kurd e